**Zanîngeha Wan Yûzûncû Yîlê**

**Enstîtuya Zimanên Zindî**

**Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

# RENGDANA FOLKLORÊ DI DESTANA MEM Û ZÎN YA EHMEDÊ XANÎ DA

**Teza Lîsansa Bilind**

**Amadekar**

**GORAN ALI SALIM**

**WAN – 2017**

**Zanîngeha Wan Yûzûncû Yîlê**

**Enstîtuya Zimanên Zindî**

**Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

# RENGDANA FOLKLORÊ DI DESTANA MEM Û ZÎN YA EHMEDÊ XANÎ DA

**Amadekar**

**GORAN ALI SALIM**

**Şêwirmend**

**Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ**

**WAN – 2017**

**KABUL VE ONAY SAYFASI**

**YAŞAYAN DİLLER ENSİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

24.01.2017 tarihinde **GORAN ALI SALIM** tarafından hazırlanan "**Rengdana Folklorê Di Destana Mem û Zîn Ya Ehmedê Xanî Da**" adlı tez çalışması aşağıdaki jüri tarafından OY BİRLİĞİ / OY ÇOKLUĞU ile Yüzüncü Yıl Üniversitesi **KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ** Anabilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak kabul edilmiştir.

**Danışman:** Doç.Dr. Vechi SÖNMEZ İmza
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
İlahiyat Fakültesi Kelam ABD

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum: ........................................

**Başkan** : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Kürt Dili ve Kültürü ABD

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum: …………………………..

**Üye** : Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ
Bitlis Eren Üniversitesi
İlahiyat Fakültesi Tefsir ABD

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum: ..……………………………

Jüri tarafından kabul edilen bu tezin Yüksek Lisans Tezi olması için gerekli şartları yerine getirdiğini ve imzaların sahiplerine ait olduğunu onaylıyorum.

Prof. Dr. Murat DEMİREL
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Yaşayan Diller Ensitüsü Müdürü

**ETİK BEYAN SAYFASI**

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında "**Rengdana Folklorê Di Destana Mem Û Zîn Ya Ehmedê Xanî De"** ;

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

**GORAN ALI SALIM**

**Wan-2017**

**KURTE**

**RENGDANA FOLKLORÊ DI DESTANA MEM Û ZÎN YA EHMEDÊ XANÎ DA**

Folklor beşeka giring ya canda gelan e. Eger naveroka Mem û Zîna Ehmedê Xanî ser bisekinin gelek babet û mijarên curbicur yên folklorî berçavên me dikevin. Ev babet û mijar cihê şanazî û vekolîn û şirowekirina akademî ne.

Jiber vê pêdivîye sedan û hezaran vekolînêr zanistî liser xebat kirine ku gencîna kelepura gelê me tijîtir bibe. Her çendî ku di nava pirtukxanên Kurdî da bi rengekê berbelav navê Ehmedê Xanî û berhemên wî dihate bihîstin û dîtin. Belê heta niha heqê wî bi dirustahî nehatiye dayin jiber ku Ehmedê Xanî zêdetir şa'êrekê mezin bûye di heman deme da 'arf û sufîyekê binav û deng jî bûye.Rexnegirekê xwedan nav bûye, meleyekê rastgo bûye, kesayetekî şareza û neteweperest û dilsoz jî bûye. Lêbelê hemen dem feylesofekê kamil û tijî zanyarî, kesateyekê civakî jî bûye, di meydana eşqa heqîqî da camerekê jêhatî jî bûye ... hwd. Zanayekê mezin û çelenge ku liser hemû xwandevanan tesîreka bêdawî hiştîye.

Ehmedê Xanî beşeka mezin ya Mem û Zînê da zêdetîr mebesta serekî ya babetî, çendîn mebest û amajên din bikaranîne da ku nifşen nû hişyar bike û hewl daye, bizav kiriye berhema xwe da beşeka girîng babetên folklorî û navxwuyî û milî û civakî yên serdemê xwe bo me behis bike.

Di Mem û Zînê da zêdetir hizir û ramanên navxwuyî û milî yên dema xwe behs kiriye ku Ehmedê Xanî bi xwê jî bawerîya xwe pê nehanîye. Belê ji ber ku çareserîyê tengasîyên xelkî xwe yên pêşîya xwe bizava (aksîyon) komkirina wan daye, jiber vê me jî bi pêdivî zanî liser layekê Mem û Zîn a Xanî karên xwe encam bidin ku ew armanç jî rengdanên folklorî ne.

**Peyvên Sereke:** Mem, Zîn, Ehmedê Xanî. Folklor, Edebiyata Gelêrî.

## ÖZET

## FOLKLORİK BİR RENK OLARAK EHMEDÎ XANÎ'NİN MEM VE ZÎN DESTANI

Foklar halk kültürünün önemli bir alanıdır. Şayet Ahmedî Xani'nin Mem û Zin eserinin içeriği üzerinde durulursa diğer eserler gibi birçok renkli konu ve manzara göz önüne çıkacaktır. Bu eserin folklorik içeriğide akademik olarak araştırma ve çalışma alanıdır.

Bu ihtiyaçtan dolayıdır ki miletimizin kültürel hazinesinin dolması için yüzler ve hata binlerce çalışma yapılmıştır. Her ne kadar Kürdistan'daki medrese ve kütüphanelerde Ahmed Hani ve eserlerinin ismi duyumuş ve görülmüşse de şu ana kadar onun hakkı tam olarak verilmemiştir.Çünkü Ahmed Xani büyük bir şair aynı zamanda bilinen arif ve sufî bir kişiliktir. Bununla birlikte önemli bir edebi kişilik, doğru söyleyen bir hoca ve milletini seven, düşünen ve sorunlarına içtenlikle çareler arıyan bir ekoldur.

Ahmed Xani kendi dönemi ve öncesi dönemlerdeki sosyal konuları folklarik olarak Mem û Zin eserinde önemli bir yer vererek işlemiş ve yeni nesiller için de geçmişin yanlış ve sıkıntılarının olmamasını işaret etmiştir. Hani, Mem û Zin eserinde kendi dönemi ve öncesi dönemlerin milli ve sosyal sorunlarından içtenlikle behs etmiştir. Kendisinden önceki yanlışlara tam anlamıyla kendiside inanmamiştır. Evet milletinin kendisinden önceki sıntılarını görmüş ve aksiyoner bir tarzda çaresinin olacağini fikir ve tecrubeleriyle bu eserinde işlemiştir. Biz de bu derin ve içten mefkureyi gördüğümüzden foklorik olarak nasıl izah ettiğini çalışmamızda konu olarak ele aldık.



**Anahtar Kelimeler:** Mem û Zin, Ahmedî Xanî, Foklor, Halk Edebiyatı.

**SUMMARY**

(Means reflecting folklore in "Mam and Zin" which is the epos of Ahmadi Khani)

Initially this topic consists of three sections. In each section, are gathered from a few subjects.

The same as specified in the following briefly:
Chapter One: the ideological aspects of folk literature in general spells out. Also a few ayristilmis separate issue in the format.
First topic: the meaning of folklore and Polish
Second topic: characteristics of folk literature
Third topic: folk literature of the history of Kurdistan and the world
Fourth topic: folk literature and folkloric literature of the Department of analysis of the language of a few moments brought.
Legends, stories, legends, Proverbs, folk songs
Chapter five: this chapter has been made into the relationship between folklore and literature.

Chapter six: relations with the poets of folk literature. Again the attention to the essence and content of the epic written by ehmed xane LED.
Second issue: in general practice lesmey is directed. In this study, MEM and Zin are the colors of folk literature in more parts of the saga. Ehmed's folklore in the departments of literature, the epics xane, the chapter was separated in seven separate format. (Legends stories, legends Proverbs, folk songs, etc.)
Third topic: in the section " The study was carried out in the general sense. MEM and zin xane ehmed the analysis of folk literature is a part of the saga. In this study, two separate titles and chapters, consists of.
Chapter One: the language of poetry and in the saga of ehmede xane xane the practical aspects of language processed.
Second chapter: in a general sense, as ideological and practical xane's poetry poems and paintings into the narrative are made. This chapter also bad feelings.

**Key Words:** Mem û Zin, Ahmedî Xanî, Folklor, Classical Kurdish Literatuare.

**SPASÎ- TEŞEKÛR**

Spas ji bo Xwedayê mezin ku ez gehiştandime vê rojê min xwandina xwe ya lîsansa bilind bi kêyfxweşî û aramî temam kir.

Ji bo vê xebata dilnizim spasî û rêzên xwe pêşkeşî hemû arîkar û piştgirên xwe dikim. Bêguman amadekirina xebateka wiha hêsan nebû. Ji ber vê jî danîna çarçoveya vê xebatê û gihîştina encamên rast û durist gelek dijwar bû.

Her weha di amadekirina vê tezê da alîkirin û hêsankariyên mamosteyê min ê hêja Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ û arîkariya dost, heval û mamosteyên min ên hêja cihê rêzê ne. Ji ber vê yekê ez di serî da spasiya mamosteyê xwe yê rênîşander birêz Vecihi Begê ku erkê şêwermendiyê ji min ra kir û hertim digel min harîkar bû her ji dana zanyarî û asankirin û şîretan û digel min mandî bû ra dikim.

Spasiya hemî mamostayên Zanîngeha Yuzincîyilê Beşa Zimanê Kurdî dikem ku herdem digel min harîkariya min kirine.Ji tayebetî ji pevajoyê da bi hizir û raman xwe yên fermî min ra parvekirin birêz Doçentê Alîkar Nesim SÖNMEZ ra dikim

Ji ber dewlemendî kirina teza min, pêşniyazkirina hin çavkaniyên girîng û rexneyên xwe yên di cih da ez malavahî li rêwşenbîrên gelê xwe dikim.

Herwiha ji bo ku di nava kar û barên xwe yên giran û gelek zêde da ji min ra wext veqetandin teza min xwendin, nirxandin û bi pêşniyazkirina hin çavkaniyên girîng yên zaravayê Kurmancî ve ev xebat dewlemend kirin û ji xwe jî hemwelatiyê Ehmedê Xanî bû. Ez spasiyeke pir ji dil û can pêşkêşî hevalê xwe yê lêkolîner Ahmed ÖNER ra dikim.

Ji bo peydakirina hinek çavkaniyên zaravayên Kurmanciya navendê (Soranî) û wergerandina hinek peyv û hevokan ez spasiya dostê xwe yê hêja Zimannas Mohammed Mêrgeyî Rewandizî dikim û bi minet keda wî bi bîr tînim û malavahî lê dikim.

Spasiya malbat û xuşk û birayên xwe dikem ku hertim piştevanê min bûn.Ji bo ku bi hebûn û perwerdekirina min, hebûna xwe va kêfxweşî û feyzê dide min, ez vê xebatê diyarî dayîka xwe ya temen dirêj û digel hemû alîkare min xwişk û birayên xwe yên ji dayîka min ra jî diyarî dikim.

NAVEROK

**KABUL VE ONAY SAYFASI** ........ **3**
**ETİK BEYAN SAYFASI** ........ **4**
**KURTE** ........ **I**
**RENGDANA FOLKLORÊ DI DESTANA MEM Û ZÎN YA EHMEDÊ XANÎ DA** ........ **I**
**ÖZET** ........ **II**
**SUMMARY** ........ **III**
**SPASÎ- TEŞEKÛR** ........ **IV**
NAVEROK ........ V
**KURTEBÊJE** ........ **VIII**
**PÊŞGOTIN** ........ **IX**
**DESTPÊK** ........ **1**
**BEŞA YEKEM** ........ **4**
**1. LAYENÊ TİYORİ YA EDEBYATÊN FOLIKLOR** ........ **4**
1. 1. Zarav û Pênaseya Foliklor ........ 4
1.2. Dîroka Edeba Foliklorî Li Cîhanê ........ 7
1.3. Dîroka Edeba Foliklorî Ya Kurdî ........ 9
1.4. Taybetmendyên Edeba Foliklorî ........ 10
1.5. Kumkirina Edeba Foliklorî Ya Kurd ........ 12
1.6. Pişkên Edeba Foliklorî ........ 15
1.6.1. Gutnên Mezinan ........ 17
1.6.2. Çêrok ........ 20
1-6-3 -Efsane ........ 22
1.6.4. Dastan ........ 23
1.6.5. Sitiran ........ 24
1.6.6. Axftinên Nesteq û Kartêker ........ 25
1.6.7. Heqîqet “Heqayet” ........ 26
**BEŞA DÛYEM** ........ **28**
**2. JIYANNAMA EHMEDÊ XANÎ Û ÇEND LAYENEK JI NAVEROKA BERHEMÊN WÎ** ........ **28**

2.1. Jiyannama Ehmedê Xanî ........................................................................ 28
2.2. Çend Layek Ji Naveroka Berhemî Ehmedê Xanî. ................................................ 30
2.2.1. Xanî û Netewayetî ........................................................................ 30
2.2.2. Amajeya Încîlê Di Mem û Zîna Xanî Da ......................................................... 32
2.2.3. Xanî û Pesna Pêxemberî ........................................................................ 33
2.2.4. Xanî û Evîna Xwudê ........................................................................ 34
2.2.5. Amajên Quranê Di Nav Mem û Zînê Da ......................................................... 36
2.3. Di Navbera Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Memê Alana Foliklorî Da ......................... 39
2.3.1. Kesayetî (Qehremanî) ........................................................................ 39
2.3.2. Zîn û Stî ........................................................................ 42
2.3.2. Qaremanên Serekî ........................................................................ 43
2.3.4. Zîn Şanazyê Bi Her Sê Birayên Xwe Deket ......................................................... 43
2.3.5. Beko ........................................................................ 44
2. 3. 6. Gurgîn ........................................................................ 45
**BEŞA SÊYEM ........................................................................ 46**
**3.RENGVEDANÊN FOLIKLORÎ DI MEM Û ZÎNA EHMEDÊ XANÎ DA ......................... 46**
3. 1. Dastan ........................................................................ 46
3.1.1. Dastana Rostem û Zorab yan jî (Rostemê Zalê) ......................................................... 47
3.1.2. Dastana Wamîq û 'Zra: ........................................................................ 47
3.1.3. Dastana Leyla û Mecnun ........................................................................ 48
3.1.4. Xusr û Şîrîn yan jî Ferhad û Şîrîn ......................................................... 49
3.1.5. Dastana Şêxê Sen'an ........................................................................ 50
3.2. Efsane ........................................................................ 51
3.2.1. Kund - Bum ........................................................................ 52
3-2-2- Cih Gohrîn ........................................................................ 53
3.3. Gutnên Mezinan ........................................................................ 54
3.4. Çîrok ........................................................................ 56

3. 5. Hijmar ........ 59

3.5.1. Hijmara Êkan ........ 59

3. 5. 2. Hijmara Duduyan ........ 60

3.5.3. Hijmare Sisêyan: ........ 61

**ENCAM ........ 62**

**LÎSTA JÊDERAN ........ 64**

**KURTEBÊJE**

Di kurtebêjeyên vê xebate da hatin bikaranîn û şîrowekirin wan ve li jêr hetine pêşkeşkirin.

| **Kurte** | **Şîrowe** |
|---|---|
| amd | Amadekar |
| B | Beş |
| b.n.b | berhema nav borî |
| Bnr | Binêre |
| Ç | Çap |
| Ç.P | Çav Pêkeftin |
| C | Cild |
| H | Teqwîma Hîcrî |
| Hwd | Her wekî din |
| J | Jimar |
| Ko | Kovar |
| M | Teqwîma Mîladî |
| N.D | Nama Diktorayê |
| N.M | Nama masterê |
| P.m | Pêş Mîladî |
| R | Rûper |
| r.a | Rehma Xwedê Lê be |
| R.B | Rojnama bizav |
| S.x.l | Silava Xwedê Lê be |
| T | Teb'e |
| Wer | Werger |
| Weş | Weşanger/Weşanxane |

**PÊŞGOTIN**

Sedemê hilbijartina vê babetê ewe kû, nebuna babetên zanistî yên liser bandorîya wêjeya folklorê di destana Xanî de. lê belê çi babet li ser vê çêkiriye? kû beşên wêjeya folklorê di destanê de. mînak: bilindîya efsaneyê di nav destanê de yan jî pendên pêşîya di nav destanê Kurdî de. lê heya niha çi babet akademî û zanistî nîne kû liser bandorîya wêjeya folklorê di hemû beşên vê destanê de.

**Giringya vê Mijarê**: Folkilor mijareke ku dibe şunas û nasnameyên her mıletekî liber vê yekî lêvekolîn li ser folklilorê ve karekî pir giring û mezne. Her wisa giringîye vê tezê eve ku heta niha bı awayîyekî kêm lêvekolînên akadîmî û zanistî li ser van mijaran hatiye kirin. Her wisa di derbarê ahmedê Xanî jî ve li aliyên bikar înana folkilorê de gelek gutubêj tune ye.

**Mîtoda Mijarê:** Ev mijare bi mîtoda wesfî ġirovekarî piraktîkê di destnîşankirina beşên wêjeya folklorê di destana "mem û zîn " ya ehmedê xanê de. ku rêbaza wesfî - şîkarî hatıye bıkaranîn.

**Arîşên Mijarê**: Nahête veşartin di cêbecêkirina vê xebatê de vekoler tuşî çendîn astengan bû, li pêşya hemyan hejarya pertûkxana Kurdî bi jêderên pêtivî, çunkî ev babete babetekê gelekê kevine taze giringî pê hatî ye dan, her weha arîşa zaravan êk ji astengan bû ku geleg caran neçar bûye pena ji bo dirust kirina hink zaravan bibet, pêxemet bikarît berdewamyê bidete mijara xwe.

**Peykerê Mijarê:** Di vê mijarê de kurte bi zimanê (Kurdî û turkî û îngilîzî) hatiye nivêsandin, dîsa û Spasî û kurtibêjî naverok û pêşgotin û destipêk û ev mijare ji dû beşan pêk dihêt, di destipêkê de bi kurtî behsa folilor û çemk û zaravê wê hatîye kirin.

Beşa yekem li jêr navê layenê pıraktîkî yedebyatên folıklor ye, di evê beşey de me zarav û pênaseya foliklor behis kirin, her weha dîroka edeba foliklorî li cîhanê hatine berçav kirin, dîsa dîroka edeba foliklorî ya Kurdî:.....hwd. hatine behis kirin.

Di Beşa diwê de, ku li jêr nav û nîşanê jiyannama Ehmedê Xanî û çend layenek ji naveroka berhemên we, ku têda behsê jiyannama Xanî û çend layek ji

naveroka berhemî Ehmedê Xanî û di navbera Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Memê Alana foliklorî da hatîye kirin.

Beşa sêyem li jêr navê rengvedanên folklorî dı Mem û Zîna Ehmedê Xanî da di evê beşey de me behsa dastan û efsane û çîrok û hijmar û kirî ye.

Li dawiyê de dixazim bibêjm ji ber dewlemendya vî babetî me nekarî hemî layenên edebî werbigirîn tinê foliklor hatiye wergirtin, ev xebate jî bê kêmû kasî nî ye lê hîvîdarim karîbim hinek layenê windabûy vî babetî xuyabikem û tiştekê nû dinav cîhana edeba Kurdî de zêdebikem.

**DESTPÊK**

Zaravê foliklor bo hemû ewan berhemên edebyên kevin di hête bikarînan, zêdebarî ku li destipêkê Xudanên wan berhev û dyarbûn, belê di nha da kes xwe bi Xudanê wan nabînît, anku hemû wan berheman bixuve digrît ku Xudanên wan dyar nînin, yan jî dyar nînin, edebyatên folkorî paşmaweyên gelên berî şaristanyane, edebyatên folkorî çafkanyeka giring û bi bhaye, bu zengînkirina edebyatên nû, ji bervê pranya edebvan û şa'êran di bnekukirina deqên xweyên ş'rî da mifa ji berhemên foliklorî wergirtye, bivê yekê jî Ehmedê Xanî dibnekuka dastana Mem û Zînê da çendîn babet û tewer ên foliklorî wergirtîne û di pişt evan babetan jî da bizavkirye merem û armancên xwe bi detin xwandevanan, ev yek jî deryekê bo vekuleran ve di ket daku zêdetir giringyê bi foliklor û berhemên folikloryên xwe biden.

Her wekî li destipêkê me amajepêkrî ku edebyatên foliklorî edebyateka giring û çafkanyeka zengîne bo edebyatên nivîsî, zêdebarî nuşandna buryê gelan ji aliyê babetên foliklorî ve eger seha berhemên pranya şa'îrên Kurdî û gelên din bkeyn, diyar dibît ku ewan mifayekê zor li berhemên foliklorî wergirtye, anku foliklorî giringyeka bê mînak û rulekê baş di zengînkirina edebyat û keltûrên gelan da heye.

Zêdebarî wê giringî ya ku me li bara foliklorî êxistye berçav, belê li gel vê yekê jî kêm vekulîn liser vê yekê hatînekirin, eger seha pirtukxaneyên Kurdî bkeyn jiblî hindek çafkanyên kêm çû tişt dvî warîda nahête dîtin, û vekulîneka ekadîmî liser rul û giringî ya foliklorî ji aliyê şa'îran ve nehatyekirin û eger hatbîtekirin jî zor bi kêmî hatînekirin, anku valatyeka zor liser evî babetî heye, ji bervê me bi erkê ser mlên xwe zanî ku babetekê liser vê yekê encam bi deyn bi nav û nîşanên rengvedana foliklorî di Mem û Zîna Xanî da û buye nav û nîşanên vekulîna me.

Armanca giştî ya vekulîname danenyasîna çemk û zaravên foliklorî û giringî û taybetmendyên wê ye, eve zêdebarî êxistne berçav ya pişkên foliklorî, armanca taybetî ya vekulîna me rengvedanên babetên foliklorî ye liser dastana Mem û Zîna Ehmedê Xanî, anku êxistne berçav ya pişkeka ewan babetên foliklorî ye ku di Mem û Zîna Xanî da di hêne dîtin.

Di vê vekulînê da me mifa ji rêbaza vekulînên wesfî û şiluvekarî wergirtye, bi rengekê di bişa êkan da bi tîwrî me behsê babetê xwe kirye û bo vê meremê jî me pêdvî bi rêbaza wesfî dibît, di bişa duduyan da û siseyan jî da me karê xwe bi rengekê şiluvekarî encam daye û ji bervê em rêbaza şiluvekarî bi pêdivî di zanîn bo vekulîna xwe.

Di vê mijarê de em rastî çend asteng û pirisgirêkan buyne, ji wan jî:

- Nebûna çafkanyên pêdvî liser babetî.

- Giranî û allozî ya hizrên ş'rên Ehmedê Xanî.

- Allozî û dijwarî û zmanya Xanî ku em bi zaravê soranî daxvîn.

- Eve û çendîn prisgirêkên din li dema xwandna vekulînê dad hêne dîtin.

Ev vekulîne ji kurtek û pêşgotnrk û sisê beşan û encam û lîsta çafkanyan pêk hatye , li destipêkê bi kurtî me behis li babetê xwe kirye û duvda me pêşakêyek nivîsaye û duvda me naveroka vekulîna xwe bi ser sisê beşan dabeşkirye , beşa êkan layenê tîwrî ya edebyatên foliklorî bxuve digrît û me dabeşkirye bo ser çend tewerekan û tewerê êkan zarav û pênasa foliklorî êxistye berçav û di tewerê duduyan da me behis li dîroka edeba foliklorî li cîhanê kirye û tewerê sisêyan jî da me behsê dîroka edeba foliklorî ya Kurdî kirye , di tewerê çwarê jî da taybetmendyên edeba foliklorî runkirîne û di tewerê pêncan jî da behis li kumkirina edebyatên folikloryên Kurdî hatyekirin , di tewerê şeşan jî da me behis li pişkên foliklorî ji wan jî gutnên mezinan , çêrok , dastan , Sitiran , axiftnên nesteq û heqîqetê kirye.

Di beşa duduyan da jiyana Ehmedê Xanî û çend layekên naveroka berhemên wî behis krîne , û ev yek jî hatye dabeşkirin bo çend tewerekan di tewerê êkan da me behis li jiyana Ehmedê Xanî kirye , di tewerê duduûyan jî çend layekên naveroka Mem û Zîna Xanî êxsitîne berçav ji wan jî Xanî û netewayetî , amajên ncîlê di Mem û Zîna Xanî da , Xanî û pesna pêxemberî , Xanî û evîna xudê, amajeyên quranê di Mem û Zînê da , di tewerê sisêyan jî da me behis liser Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Memê Alana foliklorî kirye, me çend nêzîkyekên wan herdû berheman destinîşan krîne , ji wan jî ji rûyê qaremanî , zîn û stî , qaremanên serekî , zîn şanazyê bi hersê

brayên xwe di ket , Beko , Gurgîn , di beşa sidêyan jî da kesek dhêt rengvedanên foliklorî di Mem û Zîna Xanî da ev beşeşe hatye dabeşkirin bu çend tewerekan , di tewerê êkê da behis li dastan û tewerê duduyan behsa çêrok û tewerê sisêyan behsê efsane û tewerê çwarê jî gutnên mezinan kirye û êxsitîne berçav , li dumahya vekulînê jî em gehşitîne çend encaman û li me ew encam li dumahyê beşa sisêyan da nivîsayne.

Di vê vekulînê da me mifa ji çendîn çafkanyên Kurdî û 'erebî û farsî wergirtîne, yên kevin û nû, li demahya vekulîna xwe bi rengekê rêk û pêk û zansitî me ew çafkanî rêzkirîne.

**BEŞA YEKEM**

# 1. LAYENÊ TİYORİ YA EDEBYATÊN FOLIKLOR

## 1. 1. Zarav û Pênaseya Foliklor

Diyare, ku zaravê foliklor mil bi milê pêkhateya civakê foliklor ya îngilîzî hatiye û paşî ligurî qunaxên pêşkeftin û dahênanan gorankaryên bineretî têda hatîn ruydan, ya rûn û aşkiraye jî ku her gelekê ligurî kawdanên taybetyên xwe tiştek lihember foliklor hebûye, û ji bervê ligurî ewan baruduxan saluxetên taybet bixuve wergirtîne.

Zaravê foliklor ji dû pişkên serekî pêkdihêt, ya êkê folk ku lihember xelk dihêt û lore jî bi ramana pêzanîn, yan jî hikmet dihêt, têkra herdû zaravan jî anku bi herdû pişkên xweyên serekî ve bi ramana serbûra gelan yan zanîna gelan[1] dirawsitît, zaravê foliklor bi çendîn rengên jêkcuda hatiye pênasekirin û her wlatek jî bi reng û quçimkekê nasandin ji bo foliklor kirye, bivî rengî her welatekê zaravekê taybet bixwe hebûye mînak li welatên latînî peyva yunanî mêmus yan bo hevşuyên xwe folk bikarînaye , li ferensa jî hetaku sala 1880 zaravê dîmolojî yan jî dîmosîkolojî hatiye bikarînan hetaku gaduz û sîylot ser ji nû zaravê foliklor carek din înaye cîhana foliklorê ferensa , û li îspanya jî zaravê dîmolojî û li îtalya zaravê dîmolojya, û eve û zaravê fulkiskind ya elmanî di demê Xuda li sala 1806 - 1808 nugerî ya nû bikarînaye û heta radeyekê ev yek vemrandye û hetaku rayl nehatî nejiyayeve .[2]

Zaravê foliklor dîrokeka kevnar heye û hindek ji vekolerên divî warîda nkarin , yekemîn kesê ku ev zarave bikarînayî destinîşan biken , bi ramanek din bi buçûna pişkek ji zanayan û bispûrên foliklor, hetaku niha neşyayne destipêka bikarînana foliklorî, yan jî yekemîn damezrênerê zaravê foliklor destinîşan biken , ev yek jî ji ber wê yekê ku her welatek bi rengekê serederî li gel evî babetî kirye, rayl

---

[1] Yurî Suluv, *Qezaye û Terîxe* (Tircume: Hilmî Ş'rawî û 'Bdalmicîd Hwas), Alhe Almêrîye Lltirrlîf û el-Nişr, Qahre 1971, r 17.

[2] Xald Cutyar, *Berew Foliklor*, Weşanên Hewadis, Bexda 1984, r. 39-40.

zur bizavkirin ku yasayên siroştê jiyana milî bi selmînît , û karekê bi mifa û mifadar jî jbu baruduxê hawêkirina evê yasayê kir.[3]

Cawîd li bara foliklor di bêjît edeba foliklor ew rewşenbîrya giştî ye , ku li zardevekê dihête vegêran[4], û ji bervê yekê nikarîn bi sanahî yekemîn kesê ku zaravê foliklor bikarînayî destinîşan bi kîn, bi buçûna kumeka foliklorinasan jî damezrênerên kumela edebyatên fîlendî 1831 kevnartirîn kumela foliklorî ye li hemû cîhanê, [5] belê zaravê foliklorî dîrokeka duyr û drêj heye , sereray ku hindek di bêjin : Yekemîn kesê ku zaravê foliklorî bikarînayî wilyem tomis bû li sala 146 weku zaraveyekê zanistanî înaye di nava qada zaravên zansitî da [6]. Piştî ewropyan , gelên weku fars û 'ereb û Kurdan ... Hwd giringî bi vê yekê daye û zaravên jêkcuda bu bikarînayne bi rengekê ku di zimanê farsî da ferhenga merdemî , adbyat tud , adbyat 'amyane û hatîne bikarînan û ji aliyê 'ereban jî ve aladb alş'bî , aladb alşifhî, alapar alş'bye î.[7] hatîne bikarînan û di zimanê Kurdî jî da edeba milî , edeba cemawerî , edeba foliklorî [8] bo hatîne bikarînan.

Ligurî ewan nasandinên ku li bara foliklorî hatîne di rujevê da , foliklor pêkdihêt ji pêkhateyeke ji kumeka çêrok û nukte û sitiran û awaz û kumek ji edeb û rêwrismên civakî, ku kumeka kesan , yan kumeka mirovan di serdemekê da afirandîne û kara kirîne , ji bervê cîl bo cîlî bûme mayne, bi rengekê sanahî ji derbirîn û bi rengekê sade hemû tiştên gelan bûme dyarbuyne, ku bo kartêkirin û karvedan û nasnama civakî di pêtivî bûn, ji berku zimanî zengîn di ket û çewanya

---

[3] Xald Cutyar, *Berew Foliklor*, r. 40.

[4] Şehla Kerîm Hisên, *Karîgerî Edbî Foliklor Leşî'rî Medhed Bêxew Da*, Weşanên Zankoya Selahedîn, Hewlêr 2015, r.4.

[5] Xald Cutyar , *b.n.b.*, r.28.

[6] Şehla Kerîm Hisên, *b.n.b.* , r.4.

[7] Îbrahîm Hesen Hemed, *Rengdanewey Kelepur Le Romanî Kurdîda Başurê Kurdistanê,* Weş. Rojhellat, Hewlêr 2012, r.22.

[8] Lîjney Edeb Lekorrî Zanyarî Kurdistan, *Zarawey Edebî*, Weş. Wezareta Perwerdê, Hewlêr 2006, r.39.

jiyan û dîroka evî civakî dyar di ket, curên jiyanê dêxîte berçavên me û di bîte sedemek bu dyarkirina gerinitî û edebyatên evî gelî.[9]

Anku çû kes û layen Xudanên edebyatên foliklorî nîne , eve renge li destipêkê Xudan hebît , belê ji berku nehatiye nyasîn tuşî ji navçûnê bûye bi taybetî navê Xudanê berhemî, ji bervê pênaseyên wê jî giştgîrbûye pitir ji bû êkê , û bivê yekê jî foliklor pêkdihêt ji zanîna dab û nertên kumên xelkî û efsaneyên wan û huzan û sitiranên giştî , ku xelkî nyasîne.[10]

Bivê yekê jî edebyatên folikloryên her gelekê di bîte pişkek ji me'rîfet û rewşenbîrî ya ewî gelî, bivî rengî di rêya foliklorî da di karîn helsengandinê bu astê huşyarî û rewşenbîrî ya ewî gelî bi kîn, ji berku edeba foliklorî hunerê axiftina êksere, ev hunere jî resen û kevne e û cîl bu cîlî maye û bivî rengî diçît û girêdaye bi dab û nerîtên civakyên ewî civakî .[11]

Her di warê foliklorî da mewlud îbrahîm hesen di bêjît: Ew edebe ku dgermatya jiyanê da takên civakî di nav texên jêkcudayên xelkî rujane weku pêdivyek berhem dînin û kum werdigrin û berdewam bi kardînît û dparêzît. [12] Û ev yek jî bi wê ramanê dihêt ku edebyatên foliklorî desthatên ezmûnên mezinên mirovatyê ne, xezinkirineka herdem ya zêndî û pledare, samanekê zanyaryên giran bi haye ku sedan salan pêş niha hatîne afirandin[13].

Renge ew yek jî rast bît, dema ku di bêjîn, foliklor zanistekê mirovayetyê mezine û eger em pişt bi deyne evî berhemê giring, raman ewe ku me piştaxwe kirye bihayên mezinên mruvayetî û civakî.

Edebyatên foliklorî bi rengek giştî paşmayên ewan me'rîfet û rewşenbîryên kevnarên destipêka jiyanê ne û bûyne xezinkirineka baş bu avakirina berhemên nû û dahênanên bereket, her çende ku di edebyatên foliklorî da destipêkê Xudanê wê dyar nîne û berzebûye, belê dema weku sermayekê edebyê nû bi karînîn,

---

[9] Nesrîn Rûkiş, *Cilwe Hay Kudek Dramat Nzim Kurdî*, Weş. Rojhellat, Hewlêr 2014, r.11.

[10] Mihemed Mu'în , *Ferhengî M'în* , Ç. Pêncê, Wîrasta Dûyê, Antişarat Alşic', Tihran 1388, r.930.

[11] Kameran Mukrî, *Edbî Foliklorî Kurdî*, Pişka Êkê, Weş. Zankoya Selahedîn, Hewlêr 1984, r.31.

[12] Şehla Kerîm Hisên, *b.n.b.* , r.6.

[13] Hîmdad Husên, *Edebyatî Foliklorî Kurî*, Bergê Êkê, Weş. Şehîd Azad Hewramî, Hewlêr 2007, r. 5.

di bîte berhemekê nû û bi Xudan , ji berku edebyat û zansitê nav xelkî ye, ji berku jmêje nivîsîn ya kêm bûye , ev edebyate di nav xelkî da hatiye ruydan û parastin.[14] evî edebî zimanê taybet bi xwe heboye û ta radeyekê baş jî zimanekê sade û duyr ji rewanbêjyê û çeq û destewajeyên alûz bûyne .bivî rengî jî ew yek bume dyardibît ku edebyatên foliklorî heta niha jî ramaneka giştî û berifireh heye , bu babet û layên din yên jiyanê , belê em zêdetir deqên foliklorî û bi taybetî jî merema me ew deqên ku peywendî bi edebî ve hey , her çend babetên din jî hene , belê diçarçuvê karên me derdi kevin , eger amaje û runahyekê bêxîne ser hemuwan , belê ewa li vêre giringe ku amajeyê bu bi kîn ewe ku foliklor êke ji bihayên bineretên zanistyên mirovayetî , belku ji êkaneyan jî ye.[15]

Eger bivê buçûnê bît, eger zansitê mirovayetî bihête dabeşkirin bu çend pişkekan, li vêre zansitê foliklorî, dê bîte êkem pişk û pila êkê hêt, ji bervê yekê hend liser demên kevnar da bhayê xwe hebûye û hend jî çavkanî û xezinkirineka başe bo edebyatên nû û çavkanyeka rewşinbîrî ya giştî ye û pêdivî ye ev bhayê giring bihête parastin û kumkirin, daku hend buryê xwe ji bîr nekeyn, hend jî ayinde û edebyat û rewşinbîrî ya xwe ber bi pêşve bbeyn.

### 1.2. Dîroka Edeba Foliklorî Li Cîhanê

Edebyatên foliklorî dîrokeka zor duyr û drêj heye , dîroka wê bi dirêjahya dîroka di rust bûna jiyanê ye, çunkî her li destipêka jiyanê çendîn arîşe û asteng keftîne ber sîngê mirovan , ev arîşe bûne sedema wê yekê ku çendîn çîruk û serbûr û axftinên xuş bhêne di hebûnê da , ji bervê berhemê foliklorî dimaweyê sedan hizar salan , bi hevdestî , bi hevpişkî ya nivşên mirovan hatîne di hebûnê da û pêgehiştye û berdewamî bi jiyanê daye[16] belê bi dîtin û bawerya pişkek ji zanan û foliklorinasan , dîroka foliklorî dzivrît bo çerxê berînya nû , ev yek jî ji ber sedemawê yekê ye ku mirovên evî çaxî , bi ravekirin û bXudankirina triş û kewalî û danana tele û çandinê , rojên xwe bi derbazkirîne , tevrên destyên vê qunaxê jî amîrên sadebûyne .[17]

---

[14] *Roçûneyek bo Edeba Kurdî Li Rojhelata Kurdistanê*, Weş.Lerya, Silêmanî 2012, r. 308.

[15] Hîmdad Husên, *Edbyatî Foliklorî Kurdî*, r.7.

[16] Hîmdad Husên, *b.n.b.,* r. 6.

[17] Şehla Kerîm Hisên, *b.n.b.,* r. 9.

Her duy serdemê ku mirovî jiyana xwe bi rav û çandinê birye serî di şikeft û daristanan da jiyaye û li hingî were curên edebên foliklorî serhildayne û ber bi pêşve çuyine, belê li bara kumkirin û çewanya parastina ewan berhemên destipêkyên foliklorî em di karîn bêjîn, ku finlendî bera hemû gelan di hênedanan, bo kumkirina foliklorî, ji berku li sala 1675m, destkekê sitiranan belavkirîne.[18]

Bi buçûna hindek ji zanayan dîroka serhildana edebyatên foliklorî dzivrît bo bo peydabûna edebî, ji berku foliklor pleyeke ji pleyên mukumên foliklorî.[19] Ya dyare jî ku dîroka edebyatên foliklorî dabeş di bît bo ser sê qunaxên serekî , ji berku ligurî ber bi pêşveçûna jiyana mirovan babetên foliklorî jî pêş di kevin , eve wê ramanê di det dema ku mirov bi zimanên zêdetir daxvît û karatir bît raman û rengevanên zêdetir bi kardînît, ji bervê ev yek buye tiştekê sanahî dema ku lihember dyardeyekê di rawestît li destipêkê ezmûna wî ya kême û duvda ligurî serederîkirina li gel ewê dyardê ezmûn jî zêdetir di bît , her ji ber hindê yekê jî ji rûyê foliklorî ve heman tişt di bît , anku eve husa xuya di ket ku qunaxên foliklorî li destipêkê , anku qunaxa êkê bi qunaxa kevnar destipê di ket û hetaku destipêka çaxê nuzdê jî dirêjyê pê di det , duvda jî qunaxa bi karbirina zimanî ye , ev qunaxe hetaku astekê blind zanayan zur giringî bi xwandina zimanê kevin di da , her ji bervê dest bi vekulînan kir liser ziman û kelepûr û keltûrên neteweyên kevnar , herwesa di qunaxa sêyê jî da edebyatên foliklorî êxiste di çarçuvekê zansitî da.

Belê weku zansitê foliklorî  hemû zana û foliklorinas di wê baweryê dane ku peydabûna zansitê foliklorî bi xwe ya girêdaye bi tevgera romanisyetê û dyare ku destipêka çerxê nuzdê jî encam û akamên temamên serhildana rêbaza rumanisyetê dêxîte berçav û zêdetir Xudanên pişkên rewşenbîrî ya milî ye weku di bêjin her weku gyanê gelane û ew peywendya bi keltûrî ve şluve di ket ku edebyatên zimanî divewjînît , hembêzkirin û helmijîna henaseya serdema xwe bo ber bi pêşveçûn û rê dîtneva cihê pêy xwe û avrî daneveyeka jîrane û rastguyaneye , ji bervê ew rûdanên milî êka wesa kirye ku zêdetir ber bi behis û xwastên kevnar ve bçît û ew hekayat û

[18] Ce'fer Şêx Hisên Berzincî, *Çend Mluyek Leşaray Foliklorî Kurdî*, Weş. Jîn , Slêmanî  1969, r,12

[19] Ce'fer Şêx Hisên Berzincî, *b.n.b.*, r.13.

ş'ri û behis û babetên di beytên gelên weku êkin rûyekê bdetê û bi helgirît û wergêran, daku li dawyê bigehîte encamekê runahî tir .[20]

Belê li bara edebyatên folikloryên Kurdî zana di bêjin: Edebên millyên gelên kevnên hindu ewrupî û hindu îranî di evsane û dastan û hekayat û sitiranan, di demekê da zur cewherên edebên folikloryên Kurdî bûn, edeba Kurdî di rêya sitiranê da siroştê gelê Kurdewarî û jiyana civakî li gel cewherên kevin têkelî hevdû kirîne û di nav êk da helbûyne, ji bervê edeba zaravên sitiranî li destipêkê hetaku niha ji edeba foliklorî ya nêzîke.[21]

Hemû çavkanî amaje bi wê yekê diken, ku berêXudan bo edeba foliklorî û bikarînan dwarekê din yê edebî da tiştekê hêbetî û hema husa nebûye, belku kumkirin û parastina wan ji aliyê vekoleran ve babetekê giring û beriname bu darşitî bûye, hetaku kar gehiştye wî astî ki pişkeka zur ya nivîseran xwe bi evî berhemê xomalî û bihave mijul biken.

### 1.3. Dîroka Edeba Foliklorî Ya Kurdî

Edebyatên folikloryên Kurdî bi ramaneka netewey ya xuve , li wî serdemî da serhildaye, ku hest bi derkeftin û geşepêdana zimanê netewey hatiyekirin , ew zimanê ku navenda devereka cugrafî ya dyarkirî bûye , li Kurdistanê destipêkê li devera derdurên şkefta şanederê şûnwarên foliklorî destpêkirîne û buye melbendekê şaristanyê zor mezin , anku melbendê avedanî û şaristanya devera Kurdistanê şkefta şanederê ye , nek bitnê eve belku bi buçûna nivîser û vekoleran keleporê neteweyî berhemê hizaran salên her gel û kumekê ne , ku pêkdihên ji ture û wênekêşan û yarî û sitiran û dawet û curên xwarinê û dab û nerîtên civakî û teblîk û kefçikên navmalê û hizir û bîru bawerên kevnar û rav û çek û pêşe û stêran bixuve digrît . [22]

Di dîroka turey ya ya Kurdî da ku behsa foliklor û edebyata foliklor di ket navê şkefta şaneder li gel hatiye herweku li destipêkê me amaje bi vê yekê krî ev şkefte cihê şaristanya dîroka mirovatî ya berî niha bûye duvda, dema ku mirovan

---

[20] Xald Cutyar, *b.n.b.*, r.9-10.

[21] Marf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergê Êkê, Ç. Dûyê , Weş. Aras, Hewlêr 2010, r.180.

[22] Sedîq Borekî , *Mêjûy Wêjey Kurdî* , Bergê Sêyî , Dezgehê Çap û Weşana Aras , Hewlêr 2008 , r.15.

dirêjî bi jiyanê dayî û şkeft hêlayî û gund di rustikrîn û piştî demekê zur karîn bajêran di rust biken , paşan li şûna xwarina berheman bûne raveker û cutyar , foliklor jî her berdewam buye şkeft û ew amîrên destipêkyên , ku di jiyana gundan da hatîne bi kardînan , hetaku gehiştye cîhana teknulujya evî serdem.[23].

Lidur edeba foliklorî ya Kurdî jî X. Abovyan di bêjît: lidev her Kurdekê hest û behremendyên şa'îrî dihête çaverêkirin û bi saz û awazan, sitiran bi dul û çiya û sulav û rûbar û gul û çek û hesp û qaremanî û cwanyan da gutîne.[24] evê yekê jî wekirye ku bala pişkek ji zana û rojhelat nasan bxu rabkêşît û welê biket ku bêjin li paytextên hindek welatên bnav û dengên ewrupî bihatirîn nivîsarên - destinivîs di kevin da dîroka Kurdan têdaye ku ya ewî gelê tebesere ku şanazyê bi xwe û belgedar ji rûyê çewanî û çewayî ve dyar di ket û gumanê nahêlît ku buryekê rast û maf û cwan û çalakaneye.[25] Anku gelê Kurd sedan hizar salaye li derdurên şaristanyeta şkefta şanederê Xudana samanekê kelepuryê bê mînake û durhavêjî havêtye buye pişkek ji welatên bnav û deng, babetên folikloryên xwe li gel folikloryên ewan welatan têkvedaye.

### 1.4. Taybetmendyên Edeba Foliklorî

Eger seha hemû nivîsarên ku li bara sîma û cudakaryên edeba foliklor û edebên nivîsayî da hatînekirin bi kîn, dê ew yek dyar bît, ku edeba foliklorî û edeba nivîsayî çendîn cudahî hene û weku dû babetên jêkcuda û bi rengekê giştî wek dû edebêt jêkcuda serederî li gel dihêtekirin, ji bervê em jî dê bizavê keyn taybetmendyên ewan herdû edeban bêxîne berçav.

**Êk**: Ji rûyê zimanî ve cudahyeka zur di navbera edeba foliklorî û edeba nivîsayî da heye ji berku edeba foliklor berhemê xelkî ye û bi giştî ji rûyê zimanî ve,

---

[23] Şehla Kerîm Hisên, *b.n.b.* , r. 13.

[24] Evrehmanî Hacî Marf , *Le Barey Kurd Nasîyewe Le Rusya û Yekêtî Sovyet*, Weş. Korrî Zanyarî Ya Kurd, Bexda 1974, r.506.

[25] Scade Aware, *Lêkollînewe Edebî Nwê Î Kurdî,* Weş. Jîn, Slêmanî 1967, r.35.

bi şêwezar û binzareve dihête berhem înan, Şedeba zarekî bi çû rengan zimanên êkgirtî nînin. [26]

**Dû**: Ji rûyê Xudanbûnê ve, herdîsan cudahî hene, herçende edebyatên foliklorî renge li destipêkê Xudan hebît, belê ji ber hend sedemên nedyar Xudanên wan wundabuyne û buyne mulkê giştî û cîl bu cîlî di hêne veguhastin di nav xelkî da. [27]

**Sê**: Ji rûyê cur û rengên vegêranê ve, edeba foliklorî cudaye ji edeba nivîsayî, ji bervê dema ku di bêjîn edeba foliklorî anku ev edebe liser ziman û di wextê vegêranê da cudahî di kevinê, raman ewe ku vegêrana wan ya jêkcudaye ji kesekê bu kesekê din û li deverekê bu devereka din, anku hindek caran vegêrana wê kêm û zêdeyî liser dihêtekirin, raman ewe ji rûyê sikter û reh û rîşalan ve gurankarî têda di hênekirin.

**Çar**: Ji rûyê belavbûna wan di nav xelkî da, ev yek jî yekemîn û di yartirîn taybetmendî ya edeba foliklorî ye, pişt girêdanê bi zarekê di ket, ji bervê şyaye bi bîte diyartirîn saluxetên wê, û ji bervê sedemê jî belav bi bît û tevgera xwe ber bi pêşve bi bet.[28]

**Pênc**: Ji rûyê dariştnê ve, hemû berhemên foliklorî sîma û şiklê xelkî bi giştî pêve dihêtedyarkirin, ji bervê eger bi kêmî, eger ne ladan têda dyar naken.

**Şeş**: Parêzvanyê ji maneva me'newî ya civakî di ket.

**Heft**: Ji aliyê hemû xelkî ve ya pesende û xelkî jî pêxuşe ku bizanin, ji berku weku ezmûneka destipêkî ya giştî ye.

**Heşt**: Ji rûyê dupatkirinê ve , êka din ji taybetmendyên edeba foliklorî ye , ji berku  li snûrê cugrafya şaristanyeka taybet da dikene binema û hêvîn û çavkanya êk dest û hevşêweyên dyarkirî , destinîşan bi kîn , ku bi rengê peyweste têda deq gelek

---

[26] Sehla Kerîm Hisên, *b.n.b.*, r.7.

[27] Mihmud Zihnî, *el-Adb el-Ş'bî el'Rbî, Mifhumet Wimçmune*, Migbu'at Cam'e el-Xirgum, Kahre 1972, r.55.

[28] Mihmud Zihnî, *b.n.b.*, r.55.

têda dupat dibneve,[29] ji bervê hemû berhemên edebyên foliklorî derbirînê ji êş û janên mirovayetyê diken û snûrên neteweyan dibrin , piranya neteweyan jî , bi zimanê xwe vedgêrin , bivê yekê jî sîmayê neteweyî kêmtir bu deqa edeba foliklorî di rust di bît û zêdetir ew berhemên foliklorî , wek edebên cîhanî derkevin.[30]

**Neh**: Ji rûyê perwerdeyî ve, edebyatên foliklorî, pişkekê weku keristeyekê bo perwerdekirina zarwan, evca çû pexşan bît, yan jî ş'ri û sitiranên layê layê bin.

### 1.5. Kumkirina Edeba Foliklorî Ya Kurd

Dyare ku edebyatên foliklorî ya Kurdî di çend qunax û çend rengekan hatîne kumkirin û ev yek jî ji ber wê yekê ku edebyateka berifireh û hemerenge û nebûna dezgeh û xemxuya babetî jî egereka dne eve sereray ku dagîrkerî û nebûna welatekê ku hemû berhemên foliklorî li jêr sîberekê kum biket, ji bervê bi çend qunaxekan da û bi çend rengekan hatîne kumkirin, bi şêweyekê giştî bûyne dû pişk ji wan jî:

**Êk: Kumkirina Edeba Foliklorî Ya Kurdî Ji Aliyê Biyanyanve.**

Li destipêka çerxê nuzdê zana û rojhelat nas û foliklorinasan destkirye bi kumkirina edeba foliklorî ya Kurdî , ji ber sedema berifirehî û bha û cwanya edeba foliklorî ya Kurdî li dumahya çerxê nuzdê hetaku dumahya şerê cîhanyê êkê çend zana û rojhelat nasek hatîne Kurdistanê , elksander jaba , okarman , fon lkun , edwardsexaw , awgost pîwterman , martîn hartman , elbertsot sotsîn , îgîn prîm ji wan bûn.[31]

Oskarman li salên 190 - 1903 da liser fermana Xudanrêz û împratorê dewlleta ellmanî hnarte îran û Kurdistanê, duy demî da bi hevkarya mzeferedîn paşayê qacar şiya gelek beytên Kurdî bi zaravên Kurdên ewê deverê kum biket weku beyta mem û zîn, nasr û mal mal, zembîl firoş û beytên 'Ebdulrehman paşayê babe.[32]

---

[29] Şehla Kerîm Hisên , *b.n.b.* , r. l7

[30] Şehla Kerîm Hisên , *b.n.b.*, r. 7.

[31] Şehla Kerîm Hisên , *b.n.b.* , r. 14.

[32] Ferhad Pîrbaal, *Kurd Le Dîdî Rojhellat Nasekanewe*, Weş. Şivan , Hewlêr 2009, r. 31.

Li dumahiya nîva êkê ya destipêka nîva dûyê ya çerxê nuzdê li rusya qeyserî edebyata foliklorî ya Kurdî dest bi kumkirinê kirye taybet jî ji aliyê foliklorinas û rojhelat nas V. Tîtêl, X. Abo Viyan, Î. Bîrîzîn, P .Lîrx-î ve.[33].

Her êk ji evan zana û foliklorinasan xizmeteka bê mînak û bha bi edeba foliklorî ya Kurdî gehandye , liserê rêza ewa zanayan jî elksander japa , ku êke ji wan rojhelat nasaye ku dmaweyê 1836 - 1869 keristeyekê zur li bara edeb û foliklor û ziman û entigrafya Kurdî kumkirîne.[34]

Piştî şoreşa oktoberê sereray ewan karên kargêrî û civakyên mezin mijulî geryanê bûye , bi duv edeba milî û kelturî ya gelê Kurdî ve bûye û li salla 1927 çuyne deverên Kurdyên ermenistana sovyetî û têksitên Kurdî nivîsayne û di encam da têksitên milî yên herdû çêrokên ş'ryên bnav û dengên mem û zîn û leyl û mecnun [35] bi dest wan keftîne , di nava Kurdên ermenistan û êketya sovyetî da pîç pîçe bi rengekê beriname darşitî roj bo rojê kumkirina edebyatên foliklorî di pêşveçunên berdewam da bûye li salên 30 ya çerxê bûrî bo kumkirina keristeyên ziman û wi entografî û foliklorî çend lîjneyek bu gundên Kurdî hatne hnartin , dû zanayên bnav û deng emîn 'evdal û hacî cindî ku dkarubarên ewan Lîjinan da hevbeşkirbûn , herwesa kunifiransa Kurdnasî ku li sala 1934 li yerîvanê hatbû girêdan bi hayekê êkcar mezin hebûye di pêşêxistna Kurdnasya sovyetî da. [36]

Eger seha ewî serdemî bi kîn dê bînîn ku emîn emîn 'evdall û hacî cindî pirtûkeka mezin ya foliklorî ya Kurdî li sala 1936 belavkirye, di vê nivîsarê da gelek sitiran û dastan û efsaneyên Kurdî tumarkirîne û herwesa rengê cudayê Mem û Zîn, Şêxî Sen'an, Leyl û Mecnun û Zembîlfiroş hatîne nîşandan, eve û çendîn karên din ku pişkek bûn ji karu û çalakên rojhelat nasan li bara parastin û kumkirina edebyatên folikloryên Kurdî.[37].

---

[33] Şehla Kerîm Hisên , *b.n.b.* , r. 14.

[34] Ferhad Pîrrball , *b.n.b.*, r. 314.

[35] Q.K.Kurdoyêv, *Kurdnasî*, (Wergêr: Rewf Hesen Rêver û Erya Xaneya Wer), Silêmaniyê 2006, r. 13- 14.

[36] Şehla Kerîm Hisên, *b.n.b.* , r. 14.

[37] Şehla Kerîm Hisên, *b.n.b.*, r. 15 .

**Dû: Kumkirina Edeba Foliklorî Ya Kurdî Ji Aliyê Kurdan Ve**

Li destipêka salên bîstan li 'îraqê bizavên take kesî di hêne berçavkirin li bara kumkirina edeba foliklorî ya Kurdî, û yekemîn çafkanî jî divî warîda hatbîte çapkirin û li berdestê me bît li sala 1933 bûye ya, Îsma'îl "heqî şaweys"e li jêr navê gutnên mezinan û gustaw lo bon.)[38]

Herwesa ji aliyê şa'îr û nivîseran jî ve bizaveka rijd û bnerehî dihête berçavkirin bo kevne şa'êr û fojnamevan û rewşenbîrê Kurd pîremêrd jî li sala 1933 da gutnên mezinan û axftinên nesteq û kartêker kumkirîne û beyt beyt di rojnameyên jiyan û jîn li sala 1950 bi rengê huzananan belavkirîne, mamusta Me’rûf Ciyawuk li sala 1938 di pirtûkek bnavê hizarbêj û pend belavkirye, ev pirtûke li pirtûkxana necah li bexda hatiye çapkirin.[39] herwesa hacî cindî li sala 1957 da pirtûkek li jêr nav û nîşanên foliklorê Kurdî çapkirye , ku pêkdihêt ji dastan û pêgutin û efsane û sitiran û sitiranên evînyê û sitiranên dawetan , gutnên mezinan û axftinên nesteq û kartêker.[40]

Li Kurdistana êranê " rojhelata Kurdistanê " çendîn bizavên rijd û mifadar hatîne havêtin u ji wan jî mihemed mukrî li sala 1951 pirtûkek li jêr nav û nîşanên sitirana " tranehay "yên Kurdî li tehran çapkirye , 'edalleyê eyubyan jî li sala 1956 pirtûkek li jêr nav û nîşanên çirkeya xec û syamendî li tewrêzê çapkirye[41] .

Li Kurdistana sûrya " Rojavayê Kurdistanê "jî çendîn bizavên giring hatîne havêtin bo kumkirina edeba foliklorî ya Kurdî ji wan jî cgerxuyn pirtûkek li jêr nav û nyanên gutnên mezinan danaye û li her sûrya jî li sala 1957 çapkirye.)[42]

---

[38] Dilşad Mehmud 'Erdurhman, *Îsma'îl Heqqî Şaweys 1894-1976*, Ç. Êkê , Rêver. Erya Rrewşenr. Îrî Ya Hewlêr 2004 , r. 111.

[39] Şukirya Resul, *Edebî Foliklorî Kurdî , Pişka Dûyê* , Weş. Zankoya Selahedîn Hewlêr, Hewlêr 1984, r. 16.

[40]'Umer Îr. rahîm 'Ezîz , *Foliklorî Kurdî Le Rwange Rrojhellat Nasan û Nuseranî Kurdewe* , Ko. Rewşenr. îrî Ya Nwê , Hijmare 11 , Kanûna Êkê 1986 , r. 318.

[41] Şukirya Resul *, b.n.b.* , r. 89.

[42] Şukirya Resul, *b.n.b.* r. 31.

Li sala 1961 Q. K. Kurdo û Margirît Rûdînko pirtûkek li jêr nav û nîşanên pend û axftinên xuşên gelên rojhelat li mosku çapkirye.[43]

Li başûrê Kurdistanê jî çendîn nivîser hizirvanên mezinên weku 'Elayedîn Scadî , Şukirya Resul , 'Îzedîn Mustefa Resul , Mihemed Kerîm Şerîf , Mehmud Zamdar , Mihemedî Mela Kerîm , 'Umer Şêx Lila , 'Umer Petî Mewlud Îbrahîm , Îdrîs 'Ebdullla.... hwd bizava kumkirin û nivîsîna edeba foliklorî dayne.

### 1.6. Pişkên Edeba Foliklorî

Edeba foliklorî ya Kurdî pişkeka giring ya foliklorî ye, çunkî foliklorî rolekê giring di gêrît di pêşkeftna tevgerên civakî û syasî û warên din da jiyan û peywendyeka temam bi zansit û zanyaryên din heye di rûnkirina hindek dyarde û rûdanên bûrî hetaku li bûrî û niha wêneyekê brîsqedarê gelaye, ku têda gutnên mezinan û sitiran û axftinên nesteq û kartêker û dastan û efsane û qaremanî û azayetî û syarçakî bi aşkiray didyarin.[44] Nek bitnê her ev yeke belku devêt bêjîn jî ku pişkeka ser zarî îye ku ew bixwe , xwe di rewşenbîrî ya gel û desteyan da dbînît ku piranya pişkên evî babetî bi başî û bi rêyek zanistyane nehatîne tumarkirin û hetaku vekulîn divî warîda nehatînekirin, û ew pişkên ku hatîne kumkirin û vekulîn liser hatînekirin hêşta destipêkî ne[45].

Di pirtûka Aşkal Alt'îr Fî Aladb Alş'bi da ku xawenê wê Nebîla Îbrahîme pişkên edeba foliklorî bo çendîn corên weku:

1- Efsane û curên efsaneyê rêbaza ulî, efsaneya gerdûnî, efsaneya hodozî, efsaneya refzî, efsaneya qaremanya Xudawendan

2- Hekayat û corên hekayatên aşupî, hekayatên mîllî

3- Metel

---

[43] Şehla Kerîm Hisên, b.n.b., r.16.

[44] - Hîmdad Husên , *Edebiyatî Foliklorî Kurdî*, r. 11.

[45] - Nr. île Ar. rahîm , *Aşkal elt'îr Fî eladr. elş'r.* , Dar Nihçe Mêr, Qahre Dun Tarîx. r.43.

4- Nukte û yarî û gepî mîllî dabeşkirîne .[46]

Herwesa 'zedîn mustefa resul di pirtûka vekulîna edeba foliklorî da di bêjît edeba foliklorî ya Kurdî herweku evê edebê ji aliyê piranya gelan û bi taybetî jî gelên rojhelatê, pêkdihêt ji çend curekên bineretî weku efsane , îposya ku hindek ji wan curan bi Kurdî di bêjinê beyt ku ev yek jî di bîte dû pişk , pişka vegêrana qaremanan û beyt û serhatyên vegêrana evînî , weku çêruk , anku hekayet , ku hindek Cihan neqil û metelok di bêjinê jî huzana lîrîk , ku hemû pişkên sitiranê bixuve digrît , weku laye laya zarwan û lawandnan jî bixuve digrît , herweku edeba foliklorî gencîneyeka zengîna gutnên mezinan û axftinên nesteq û kartêker û yarî û suhbet û metelukan heye. [47]

Kameran mukrî edeba foliklorî dabeşkirye bu ser çend tewerekan, di pirtûka edeba foliklorî ya Kurdî da:

1- Efsane

2- Dastan

A- Qaremanî

B- Dilldarî û Evînî

3- Serguzeşte (Çîrok)

A- Çîrokên bi Kêrinehatî

B- Çîrokên asayî, civakî, dilldarî û evînî, ulî

4- Sitiran

5- Gutnên Mezinan

6- Yarî û Suhbet

---

[46]- Şehla Kerîm Hisên , *b.n.b.* , r. 17.

[47] Î'zdîn Mêgfî Rsul, *Lêkolînewey Eder. î Foliklorî Kurdî, Ç. Sêyê*, Dezgehê Çap û R. elavkirina Aras, Hewlêr 2010 , r. 15.

7- Metelok.[48]

Herwesa 'Elyê Cizîrî jî di pirtûka Aladb Altfaêy Alkirdî ku bi zimanê 'erebî ye pişkên edeba foliklorî bivî rengî dabeşkirîne.

1 -Efsane

2 -Hizir û Bîrên Aşûpî

3 -Yarî û Fuhbet

4 -Yaryên Foliklorî

5 -Dastan

6 -Sitiran

7 -Hekayetên Milî.[49]

Sedîq Borek di pirtûka dîroka toreyî ya Kurdî da di bêjît foliklorî ya toreyî pêkdihêt ji çîrok û huzan û metel û yarî û suhbet û amojgarî û axftinên cihgir û nexiş û wêne û yarî û saz û sitiran û xwarin û vexwarin û dab û nerîtên civakî û sênîk û badî û kelupelên qeyteranî û tîmarkirin û hizir û bîrên kevin û xansazî û rav û çek û pêşe û pêşesazî û kelupelên terş û kewalî û stêrkvan û evan tiştan.[50].

#### 1.6.1. Gutnên Mezinan

Diyare ku mirovan li destipêka jiyanê civakekê destipêkî hebûye û bo peydakirina paryê jiyanê xwe bi ravekirinê ve mijul kirye û duvda ber bi jiyana çandinê ve çûye ji wê jî ber bi jiyana bajêran çûye , ji bervê dvan baruduxên jêkcudada û ligurî civaka xwe çendîn ezmûn û serbûr hatîne berhem , ya rûne jî ku civakê Kurdî destipêkê civakek bû , bo peydakirina paryê jiyanê zêdetir bi terş û kewalî ve mijul bûye û duvda ber bi jiyana çandinê çuye û divî warîda tamkirye

48 Kameran Mukrî Eder. î , *Foliklorî Kurdî ,* r. 38.

49 -'Lî Alcizîrî, el-Adr, *el-Tfaêy al-Kirdî, elgir. 'e alpanye*, mosse elpqafye, r. îrut , 2000 , r. 19.

50 - Sedîq R. Orekeyî, *Mêjûy Wêjey Kurdî , R. ergê Sêyê* , Dezgehê û Çap Û R. elavkirina Aras , Hewlêr 2008 , r. 15-16.

çendîn ruydanên tehil û şîrînên jiyanê , çendîn karesat û nexuşî û bextreşî û kavilkarî dîtîne. Û serencam dhemû evan serhatyan da çendîn gutin û axftinên xuş û nexuş hatîne di hebûnê da, û berhemhênerê evan serbûran jî nek bitnê li Kurdistanê, belku li hemû cîhanê nahêne niyasîn.

Piranya evan gutin û serbûran ji ber sedema ezmûnên takekesî bûyne û zur caran heta xwe dîroka wan jî dyar nîne, belê cîl bo clî bû me mayne û dijiyana kevin û niha da mifa jê dihêt wergirtin û jrûyê civakî ve zur bi mifane, çunkî gutnên mezinan ewe ku amujgaryeka rûn û êkser bo xelkî digehînît .[51]

Divî warîda di karîn bêjîn ku gutnên mezinan çrayekê runahî ye bu ruhinkirina rêyên taryên jiyanê. Bi ramanek din gutnên mezinan hişyarkirina xelkî ye di hemû ezmûn û karesatên nexoş, yan jî nameyeke xelkî di bete ser rêya rast û di rusta jiyanê, her çende ku gutnên mezinan riste û axiftneka kurte, belê ramanek kuyr têda heye.[52]

Ev axftinên kurt ji ber ewê hizira ku di nav xwe da helgirtî û buye wêrdê rojaneyê ser zimanê xelkî û her ev yek jî bûye wekrî ku ji navçûnê bhêne parastin , ji berku herdem ji aliyê xelkî ve di hêne bikarînan bo mîna di bêjin syarê hespê xelkî bî her yê bi pyay .[53]

Zêdetir bo ewê meremê hatiye bikarînan ku mirov nabînît û çav li malê xelkî bît , eger zêdetir bçîne di nava hizir û bîrên evan gutnên mezinan da ew yek dê bume rûn bît ku di bûrî û niha da heta xwe li ayinde jî nabît pişt bestinê bi kesanên din belku pişt bestin bixwe take rêye ku mirovî dgehînîte armancên serekyên jiyanê xwe eger bi dîtineka din jî seha evan gutinan bi kîn di karîn bêjîn take rêye bo gehiştna bi encamekê baş û serkeftî û herdem navenda biryarê her em bixwe bîn û her em bixwe jî nexşeyê jiyana taybetî ya xwe bkêşîn eve zêdetir ji rûyê civakî ve , belê ji rûyê zimanî ve giringî û bi hayekê zêdetir heye her çende ziman bixwe dyardeyeka civakî ye û gutnên mezinan zêdetir yasa û rêsa û destûrên zimanî liser dihête bicihkirin ,

---

[51] *Sedîq R. Borekey,* Mêjuy Wêjey Kurdî , R. ergê Sêyê , Ç. Êkê , Hewlêr, 2008 , r. 17.

[52] -'Îzedîn Mistefa Resull, *Lêkolînewe Leederî Kurdî* , Çapxaney Zankoy Slêmanî , Ç. Dûyê , Slêmanî 1979, r. 104.

[53] - 'Elaedîn Scadî , *Mêjuy Ederî Kurdî ,* Weş. M'arf, Ç. Dûyê, Bexdad 1971, r. 131.

anku ev gutine di bîte sedema zengînkirina rêzimana Kurdî û sedema berifirehkirina ferhenga zimanan , eger ji rûyê keristeyên pêkînana zimanî seh bi kînê gutnên mezinan rûlê girêyekê dbînît diçarçuvê risteyekê da wek şûna şêra ruyvî lê diken gêra.)[54]

Li vêre cihê şêrî girê ye û di nava ristê da hatiye bikarînan, hindek ji gutnên din yên mezinan risteka temame û çû kêm û kasî têda nînin. Anku hemû keristeyên ristê têda di hêne bikarînan weku distê nekarm bibmirm dê maçî kem .[55]

Li vêre hemû keristeyên risteyê bixuve girtîne weku biker û berkar û kar. Dişyan daye bi rengê risteka alûz da derbkevît weku nmûna liserî. Belê ewa ku cihê têbînyê ye gutnên mezinan çavkanyeka giring ya bnaxê deqên ş'rî ye ji edeba foliklorî hetaku dgehîte edebyatên milî û li wêrê jî bo edeba klasîk , şa'îran çendîn mînayên jêkcuda û rengaw û reng û ciwan jê di rustikirîne , her çende gutnên mezinan bi rengê sade û sanahî derdi kevin , belê di resen da hizreka felsefî ya kuyr di nava Xuda helgirtye dema ku şa'îr evê gutina mezinan bi kardînît di deqeka ş'rî da , ewa ku zêdetir rûlê gutnên mezinan dyardi ket , ji bervê bi pêdivî di zanîn çend gutinekên mezinan werbigrîn bu selmandina babetê xwe.

<u>Gull bê qincik nabê / çem bê çeqellnabê</u>

<u>Gol bê ta nabît / çem jî bê tuyrk nabît</u>

Hemdî, şa'îr hatiye û ev gutine wergirtye û kirye binekuka deqeka ş'rî û wêneyekê zor cwan jê çêkirye û ev gutine di nava xelkî da zura mşeye û zêdetir dicivakekê da hatiye behiskirin ku renge civakek baş bît belê di bît kesanên xrab jî têda hebin , ya giring li vêre ewe ku her axiftina sadeya xelkî ye hatiye wergirtin û hizir û bîreka nû û ciwantir kirye ber û ji ramana sadeya xwe duyr êxistye Hemdî di bêjît:

*Qewmî tir ger î'traçî gewrekanî Kurd biken*

*Gull debêt xarî bibê , mey bûyetî exlig û durd.*[56]

---

[54] - 'Elaedîn Scadî , *b.n.b*, r. 30.

[55] - 'Elaedîn Scadî , *b.n.b* , r. 29.

Dyare ku nîva rêza ş'rê pêkdihêt ji gull di vêt xwar bi bît ku şa'îrî ji gutina mezinan wergirtye, belê bu zêdetir piştraskirina naveruka babetê xwe li dumahyê nîva rêza dûyê têda bikarînaye û hizir û bîreka zur cwan û nayab derbirye. Gutineka din me heye ku ew jî

*Çira şewqî bojêrxoy nîye*

Ev gutine jî weku gutnên din bi hêvênê çendîn ş'rên cwan û balkêş Hemdî hatiye û mifa jê wergirtiye înaye di nava deqa ş'rên xwe û hizreka nû jê dirostkirye.

Herweku çewa ( Hemdî ) di bêjît:

*Çraxî miclîsî rendane ( Hemdî ) wadezanim yar*

*Kebo xellke şu'a'î sêberî boxoyetî memdûd* [57]

**1.6.2. Çêrok**

Diyare ku çîrok jî dema ku em li vêre amajê pê di keyn, pişkeka serekî û giringa ewî berhemê foliklorî ye yaku di hemû gelan da hebûna xwe heyî, belê her êk bi radeyekê jêkcuda, anku li neteweyekê bu neteweyekê din efça çu kêm bît yan zur girankarî bi serda di hên. Azara çîrokê , azareke evro li hemû cîhanê putekê mezin pê dihêtedan û xwandevanekê êkcar zur jî heye [58] , bu rûnikirin û derêxistna evan azara edebî , bi pêdivî di zanîn çend pênaseyekên huyrên çêrokê bi kîn , ku ji aliyê vekulerên edeba foliklorî ya Kurdî ve bo hatîne destinîşankirin , destipêkê 'zedîn mustefa resul bivî rengî pênaseya çêrukê kirye çêrok ku di nav Kurdan da bi hekayet yan neqil di bêjinê û , di nava Kurdên lurî da " meteluk " jî di bêjinê , pişkeka mezin ya edeba foliklorî ya Kurdî , çêruk ber bi pêşveçûneka dîrokî ya efsaneyî ye û jrûyê form û dariştnê ve ji wê diçît sereray ku ji rûyê naverokê ve hindek cudahî hene.[59]

---

[56] - Cemal Mhemed Mhemed Emîn, *Dîwana Hemdî*, Weş. Serkeftin , Ç. Dûyê, Slêmanî 1985, r. 243.

[57] - Ferhad Qadir Kerîm, *R inyadî Wêne Leşî'rî ( Hemdî ) Da*, N.d. Zankoya Slêmanî, 2009 , r. 93 .

[58] - Mhemed Ehmed Hesen, *R. înay Rudaw Le Çîrokda*, Ko. Raman , Hewlêr 2006 , r. 110.

[59]' - 'Îzedîn Mustefa Resul , *b.n.b* , r. 24.

Herwesa diktor şukirya resul li bara çîrokê di bêjît: Çîrok pêkdihêt ji vegêrana çend ruydanên êk li dîv êkê, ku bi ser çend kesekêk jêkcuda da di hên û li şûynewarên dyarkirî derbaz di bin.[60]

Çîrok berhemê mezin bûn û li xemrevînîy ya mirovayetî ye, hendek çîrokî jî behis li ruydanên dîrokî deket û hendek caran jî li gell hekayetan têkel debît, bi taybetî ewan çîrok û hekayetên li ser zimanê gyaneweran hatîne nivîsan. Mifa wergirtin ji samanê neteweyî ku foliklorpişkeka mezina wê ye û mifayekê mezin jê dihête wergirtin eger her pişkek ji wan pişkan werbigrîn ji rûyê vekulînê ve gelek babetên nû dê hêne dîtin ku destê kêm ji vekoleran gehiştyê.[61]

Eger seha çêrokê bi kîn dê bînîn ku her çêrokekê yan jî hekayetekê liser gelek babetên jêkcudayên jiyanê daxvît , ji berku her tayekê evan çêrokan dîrokeka kevnar heye ku bo serdemên zûyên mirovan dzivrît anku bo ewî demî ku mirovan bizavkirye ewan tiştên hêbetî bbînîteve ku bi derbazbûna dîrokê hatîne lêkdan û şluvekirina rûydanan buye sedema di rustibûna çêrokan û belavkirina wan drêya hekayat û çêrokan da çendîn rastî û curên dab û nerît û cîl bo cîlî vedguhêzît û xelk jî bi sanahî jêra fêrbuyne û çû caran jî ji bîrinaken. Ev hekayat û çêroke jî dibne sedemek ji sedeman bo alugurkirina hizir û buçûn û axiftinan, ji bervê bi hayekê mezin pê hatiyedan di dîroka hemû gelan da û erkên zor mezin dîtîne di jiyana ewan gelan da, Kurd jî weku hemû neteweyên liser rûyê zevyê Xudana samanekê zor zengîne, çîrokên foliklorî jî bi pişkeka serekî ya evan kelepuran dihête hijmartin, çêrok jî ji xeyal û efsaneyan wergêrayne û darîştye, hindekên din jî rûydanên rasteqînene belê têkelî efsaneyan hatiyekirin .

Nivîsîna çîrokan bi giştî û pişkên wê bi taybetî demeke li seranserê cîhanê deronê nivîseran yê dagîrkirî, nivîseran pênusên xwe bu evî pişka giringa foliklorî û çîroka hevçerx terxankirye, ku tameka taybet heye çû bo kesanên mezin bît yan jî zarokan. Berhem û çêrok û hekayetên foliklorî, ewên ku li berê ji çavkanyên cîhana

---

[60] - Şukirye Resul, *b.n.b*, r. 150: 'îzedîn Mustefa Resul, *b.n.b* , r. 24.

[61]- S'dalle Asma'îl Şêxanî, *Têksitên Çend Heqîqetekên Folikloryên Kurdî* , Weş. Ehwars, Ç. Êkê, R. Bexda 1978, r. 21.

foliklorî werdigrin û behsa xêr û şer û evîna welatî û rewiştekê paqij ... hwd diken û bune rêyeka zengîn bo zaroyên Kurd. [62]

Diyare berhemê çîroka foliklorî çavkanyeka baş û pêzanîn û waneyên baş fêrî zarokan kirîne, hetaku bzanin bi evan çafkanên edebyatên zarokan xêr û şerên xwe û destpakî û evîna xwe bo gel û nîştman zengîn bît.[63]

#### 1-6-3 -Efsane

Efsane pişkeka giring ya edebyatên foliklorî ye û hunerekê zor navdar û berlaveyên gelên cîhanê ye, ji bervê pênase û behisên jêkcuda liser hatînekirin efsane heqîqeteke ku ji eqlî_duyre ... Pêkdihêt ji her heqîqetekê, ku Xudanê wê dyar nebît, behis li bnekuk û encamên wê biket, yan jî ew ravekirineye, ku dicivakî da li bara sedema di rust bûna cîhan û encamdana reftarên me, ew wêneyên xwastên fêrkaryên li bara siroşt û çarenivîsê mirovan pêşkêş diken. [64]. Efsane aşûpeka duyre ji zansit û eqlî li bara di rustibûna mirov û jiyan û sedemên peydabûna jiyan û çendîn behis û xwastên din anku efsane her li wextê mirovî xwe nyasî , efsane nêzîktirîn rengê dirbrîna hest û derûn û dîtnê bûye , li bara cîhana derve.)[65]

Li bara efsaneyê xald cutyar di bêjît , efsane ligurî buçûnan curekê xwê kirinê ye li hêmayên cîhanê , aşnayetî li gel hêzên laydyê siroştî û ewên ku ligwerî buçûna efsaneyî cihê rêkxistin û gêrana alûzyên dinyayê ne [66] .bi buçûna me efsane têkeleke ji hekayetan û ku di bît rastî û nerastî jî têda hebin , ji berku berhemê hizirkirina mirovaye bi ramana efsane berhemeke ji dîroka mirovan û berhemekê hemerenge û ji encamê pêdivyên jiyan û dumahî nehatya hezên mirovî ne ku liser êk keleke û kumbûyne û gehşitîne evro li wê roja mirovan çavên xwe vekrîn û hizirkirîn û zimanê wî vebûy efsane jî bi rengê destipêkî êxistye nava ewan hizir û bîrkirinevan

---

[62] - Nahîde Ehmed, *Destipêkek Li R. ara Serhelldana Eder a Zaruyên Kurd* , r. 100.

[63] - Şukirye Resul Îrahîm, Eder. î Foliklorî Kurdî , Pişka Dûyê , 1984 , r. 177- 178.

[64] - Wlîm Ranêr, *elrêgure Û Alirrdir.* , Tircme: Aêr. ah S'dun, Migr. 'e Dar elşown Alpqafye , R. bexdad 1992, r. 19 .

[65] - Clal Tqî , *Le Yek Çûnî Efsaney Gelan* , Ko. Kelepurê Kurdî Ji, Komelan Kelepurên Kurd, Slêmanî 1992, r. 52.

[66] - Xald Cutyar , *b.n.b.*, r. 40.

da. [67] Bi buçûna hendek ji zanayan efsane tiştekê deronî ye û bi ramana afsane nîşaneke bo ew tiştê deron û rewşitî ya ku kurên ademî heyî.[68]

#### 1.6.4. Dastan

Efsane jirûyê zaravê zimanî ve li gel efsun jî dihêt dastan zêdetir bu merdatya qaremanan dihête bikarînan, peyveke di bnekuk da daxwazistan - dawastan anku cihê şer, yan jî dadistan bi ramana cihê dadî û 'edilê dihêt , di herdû waran da 'îlma belanhe di bêjît :

Tismyey hale be asmî m'li drêjbûna ziman û şekî ye, zimanê wê kurtkirye û bûye dastan (1).[69]

Ji aliyekê dinve dastan pişkek ji edeba foliklorî pêkdihêt ji ş'reka çêrok amêze û behis û ruydanan vedi gêrît ku bi jiyanê ve hatiye girêdan (2). [70]

Eger ji rûyê bnekuka ruydanê ve sehbi kînê dê bînîn, ku rûydan ji rastî û aşûpan ve têkel bûyne (3). [71]

Bi rengekê giştî dastan behis li vegêrana azayetî û mêrixwasya qaremanan di ket li dema serkeftin û qaremanya wan di şeran da, ji aliyekê din ve behis li qaremanî û xugurîkerya evîndaran di ket lihember evîna xwe, li Kurdistanê çendîn dastanên bivî rengî di hêne dîtin ji wan jî dastana Şîrîn û Ferhad, Xec û Siyamend , bi rengekê giştî dastana Kurdî , li bara dastana Kurdî di karîn bêjîn :

Dastanên Kurdî bi rengekê giştî bitnê kar liser mînayên qaremanan naket, belku wêneyekê temam li bara şer û çewanya bi hevdû gehiştna qareman û syar çak û

---

[67] - Mewlud Îbrahîm Hesen, Pêkhatey Efsaney Kurdî, Ç. Êkê , Weş. Renc, Slêmanî 2007, r. 60.

[68]' - E’laedîn Scadî , r. 104.

[69] - E'laedîn Scadî , *b.n.b* , r. 103.

[70] - Şukirya Resul, *b.n.b* , r. 88.

[71] - Eristo *, Hunerî Ş'ri* , Wer 'Zîz Gerdî , r. ergê Dûyê , Weş. Genc, Slêmanî 2011 , r. 112.

girêdana wan bi xak û nîştmanî ve diken wan xwe gurîkirina dpênav nîştmanî da dyarket.[72]

**1.6.5. Sitiran**

Sitiran tewerekê din yê edebyatên foliklorê Kurdî ye.Sitiranên foliklorî, keresteyekê herî bnekuka mozîka foliklor ye, ku pêkdêt ji:

Awaz û sitiran, awazên amrazên mozîkê, li pal cor û ruxsar û rewşit û saluxetên wê[73] . Li bara sitiranan foliklorinas di bêjin:

Eve şî'rin , di foliklorî da ku di bêjinê sitiran , ji berku di kevin da nivîsîn nebûye , şa'êrî weku sitiranê pêşkêş kirîne , belê li serdemê nû dadi bêjinê ş'ri , çunkî şa'êr ş'rê dinivîsît, duvda sitiranbêjek ş'rê di ketin sitiran.[74]

Eger seha naveroka sitiranên foliklorî bi kîn dê çendîn babet û curên wan berçavên me kevin ji wan jî syasî, ulîy, civakî , karkirin , evînî û wesfa siruştî...hwd ji bervê di bêjin huzanên foliklorî xudîkeka paqja jiyana Kurdewarî ye û bnekuka huzana Kurdî ye .[75]

Siroştê mirovî husaye, ku bo derbirîna deronê xwe herdem heza gutina sitiranê ye, anku çû helkeft nînin, ku mirovî hizir û bîrên xwe bi sitiranê têda derinebrîbît.[76] Ji bervê eger ledema karkirin û dawet û hetaxwe eger seha simînar û kumbûnan jî bi kîn dê bînîn ku sitiran gutin têda hatiye û bi rengekê ku li dema karkirina rojane û ruy bi ruîy bûna şer û alûzyan, li dema helkeftên nexoş da, wesakirye ku mirov hest û suzên xwe bu jiyanê derbibrît [77] li bara curên sitiranan mamusta nuredîn salleyî di bêjît sitiranên Kurdî 5 pişkin ji wan:

---

72 - Nurî Yasîn Hirzanî, *Miqdine Fî elfulklor elkirdî Drase Antir Û r. ulucye Actma'ye* , Migr. 'e Aşhîd Azad Huramî , Kirkuk,2006 , r.23.

73 - Mehmud Zamdar, *Dirwazeyek R. o Awaz û Goranî Kurdî*, Dar elhirye elgr. a'e , bexdad , 1980 , r.51.

74 - Drîs 'Erdulla, *Eder. î Mîllî û Foliklorî* , r. 115.

75 - Ehmed Qendîl , *Hunerî Heyran* , Weş. Rojhellat, Hewlêr 2012, r. 34.

76 - Îzdîn Mistefa Resul , *Vekolîn Li Eder. a Foliklorî Ya Kurdî* , r. 23.

77 - Îzdîn Mistefa Resul, *b.n.b,* r. 23.

Êk: Sitiranên karî: Dirîne, bêrîvanî, darvanî, karwanî, şivanî, krêkarî.

Dû: Sitiranên helkeftan: Sitiranên vekuhastna bûkê lîstik, çupî, şevbêrî û sitiranên serexuşî û tazyan û sitiranên ulî.

Sê: Sitiranên rojane: Sitiranên zaorkan, sitiranên layê layê, sitiranên evînî lawk, heyran, sitiranên peste û bilez.

Çawar: Sitiranên siyasî.

Pênc: Sitiranên azad.[78]

#### 1.6.6. Axftinên Nesteq û Kartêker

Ev babete jî tayekê giring yê edebyatên folikloryên Kurdî ye, eger seha edebyatên folikloryên cîhan û Kurdan jî bi kîn, dê bînîn axftinên nesteq û kartêker janreka giring û dyar ya ewyan edeba ye, bi ramanek din edeba foliklorî ya vala nîne ji axftinên nesteq û kartêker:

Belku axftinên nesteq û kartêker janreka serekî û serbxoye, ku di edeba foliklorî da derkeftî ya dderûnekê paqjê kesanên şareza û Xudan ezmûne, ku li bara dyardeyên jiyanê bi zimanek blind û felsefî zor cwan derbirîne, eger seha evan axftinên nesteq û kartêker bi kîn dê bînîn ku ji aliyê naverokê ve zor ji gutnên mezinan nêzîkin û hevcudakirina wan jî ya bi sanahî nine.[79]

Heta ku niha vekolîneka zansitî liser eva axftinên nesteq û kartêker, herweku di bêjin heta niha bi rengekê êklaker gutin û axftinên nesteq û kartêker ji aliyê bispûrên divî warîda nehatîne jêkcudakirin, hetaxwe di nava rûperên ferhengan jî da ev herdû zarave têkelî hev hatînekirin.[80] Di hindek vekolînan da gutnên mezinan û axftinên nesteq û kartêker têkelî hev hatînekirin , bi rengekê , ku karên vekulînan bê bha kirîne ji berku dişyan da nîne gutineka mezinan cihê axftinên nesteq û kartêker bihêtedanan, ev yek jî ji ber sedema cudahya waye bi taybetî ji rûyê

[78] - Mehmud Zamdar , *Derwazeyek R. o Zwaz Û Goranî Kurdî* , r. 53-54.

[79] - Îzdîn Mistefa Resul, *b.n.b* , r. 26

[80] - Ncim Xald Ellwenî , *Pend Û Qsey Nesteqî Kurdî Şarî Xaneqîn* , Ç. Êkê , Weş. Mukiryan , Hewlêr 2008, r. 62 .

naverokê ve  gutnên mezinan ji rûyê di naverokê ve ji axftinên nesteq û kartêker nêzîkin , belê çû ji wan yan jî nikarîn êk ji wan cihê ya din bigrît axftinên nesteq û kartêker kêmtir meremê dyardikt , anku ramana gelek tiştan nîne û daxiftnê bixwe dyar nabît , û hindek caran jî piranya kesan di ramana wê nagehin.[81]

Her weku ya dyare gutnên mezinan risteyeka temam û tejî ramane û axftinên nesteq û kartêker li gel gutnên mezinan cudahî heye, gutnên mezinan hindek caran xwazeye, hindek caran jî dirk jê dihête di rustikirin û zur car jî çiwandine, cudahya gutnên mezinan û axftinên nesteq û kartêker dwê yekê daye ku axftinên nesteq û kartêker bi giştî axiftina hemû karekê bi rastî naderêxît, gutnên mezinan herdem dû pişke.[82] Muhsin ehmed 'umer di pirtûka ferhenga edebî da di bêjît saloxetên kuyrên axftinên nesteq ewe ku mirov bi rêya wê da têbînya hizir û bîrkirinevên xwe di ket, belê gutnên mezinan cudahya xwe ji rûyê vegêranê li gel axftinên nesteq heye bo layenê giştî û têbînyan bo hizir û bîrkirinevên êkê din di ket   (5).[83]

**1.6.7. Heqîqet “Heqayet”**

Hekayat formeka vegêranê ye û pişkeka giring û çalakî ya edeba foliklorî ye heqîqet janreke , bo serdemekê nehête zanîn dzivrît , niha nehatiye dîtin û ne pena bu nhênyên mjawyên wê jî hatiyebrin , her ev duxe bûye ku takên civakî pal bdet , xwe eger liser milên aşûpî jî bît  , çendekê li bara cîhana shirbazyên duyre dest jî vegêrît [84] pişkeka zor ya hekayatan di saxin sereray ku di kevin da , ji evî cîlî bo cîlê henê di kevin da û berdewamî hatîne vegêran , hetaku gehiştye evî serdemî dyare madem ev vegêrane di zimanê hekayat û xwananên Kurdî hatiye vegêran û tumarkirin , xwandevan jî bi zimanê xweyê daykê dxûnin , anku xumalîne , sereray ku kêm û zêdeyî taryatyên efsaneyî û heqîqetên mletên din dkevîte ser  heqîqet furmeka vegêranê ye , ewan serhatî û rûydanan vedi gêrît , ku rastîne , yan ruydana rastîn li hizira heqîqeta xwaneke bi mifa wergirtin ji aşûp û bi proseyeka beruvajî hatiye

---

[81] - 'Îzaldîn Mustefa Resul, *b.n.b* , r. 87

[82] - Şukirya Resul , *Pendî Pêşînan Û Qsey Nesteqî Kurdî* , Ji R. Elavkiryên Emîndarya Rewşenr. îrî û Lawên Nawçeyên Kurdistanê , Hewlêr, 1984 , r. 24.

[83] - Muhsîn Ehmid 'Umer , *Ferhengî Eder.* , Weş. Hemdî, Slêmanî  2012 , r. 283.

[84] - Mihemed Ferîq Hesen , *Memleketî Masî* , Ç. Sêyê , Dezgehê Û Çap Û R. elavkirina Aras , Hewlêr 2010 , r. 7 .

berhem înan , regezên edebyên weku sûz û aşûp  û hizir durên cwan dbînin di drastna wê da , merema tamder û raman gehandne ji bo xelkî .[85]

Heqîqet zêdetir di jiyana gundan da hatiye nuşandan û belave û ber bi pêşve çûnê ye, bi rengekê giştî girêdaye bi jiyana ewan ve, ev yek jî ji ber sedema wê yekê ku xelkê gundan guman bi çû tiştên din nebiriye jiblî hindek babetên foliklorî û vegêrana heqîqetên rojane, ev heqîqete jî piranya wan li dema dîwan û kumbûnên şevan hatîne vegêran û armanca serekî jî pêkdêt ji hez û arezuyên gel.[86]

Ji ber sedema ewan naverukên huneryên heqîqetan pêdivî bo li dema vegêrana wan da kesanên Xudan şyan û kesanên ku dzanin baxvin ev yek vegêrabane ji bervê hetaku niha jî heqîqetên “Birayên Misrî” liser kaxezên berî tumarkirîne û dzivrin bo çerxê heştê pêş zaynîy. [87]

[85] - Îdrîs 'Erdulla, *b.n.b*, r. 27.

[86] - 'Elî Cizîrî, Rladr.  Alişfaê Alkirdî , S188

[87] - Muhsîn Ehmed 'Umer , Ferhenga Eder. î , Weş. Hemdî, Silêmanî 2012 , r. 283.

## BEŞA DÛYEM

## 2. JIYANNAMA EHMEDÊ XANÎ Û ÇEND LAYENEK JI NAVEROKA BERHEMÊN WÎ

### 2.1. Jiyannama Ehmedê Xanî

Şa'êr û hizirmend û feylesuf û 'arf û sofî Ehmedê Xanî navê wî yê di rust ehmedê kurê elyas kurê rosteme û nasnava şîxrî ya xanyan wergirtye , pişkeka evê huzê , li derdurên devera bûtan bûn , belê binemala huzanvanî bo bajêrê Bayezîdî barkirye.[88] Xanî li dûmahî pişka Mem û Zînê da bi rengekê rûn û aşkra amajê bi sala ji daykbûna xwe di ket ku li sala 1061 kuçî bûye 'Elayedîn Scadî yekemîn vekoler bûye ku ev rastye berçav keftî . [89]

Her wekî di dîroka toreyî ya Kurdî da amaje pêkirye û ev rêza huzanê jî dêxîte lber behis û vekulînê ku derbirînê li sala ji daykbûna Xanî di ket.

*Lora ku dma ji xeyb felek bû*

*Tarîx hezar û şêst û yek bû*[90]

Eger têbînya evan nivîsînan bi kîn ku li bara hyan û mirina Xanî hatîn nivîsan dê serhatî û dem burandin û mirina Xanî zur ya têl û bêle û neya rûne, her kesekê ligurî têgehiştna xwe tiştek liser nivîsaye, û her ji bervê yekê gumana wê yekê dihêtekirin ku ev salên me wergirtî rast bin. Divî warîda çend buçûnekên nivîseran êxîne berçav:

Destipêkê Dr. Bleç Şîrko di pirtûka qiçye alkirdye ‹ duza Kurdî da di bêjît Şêx Ehmed , dastana mem û zîn ê li 1591 danaye û li sala 1652 mirye [91] li bara evê dîrokê 'Elayedîn Scadî di bêjît :

Ev yek li gel evê dîrokê naguncît ji berku Xanî di bêjît:

---

[88] - Maruf Xeznedar , *b.n.b* , r. 367.

[89]- 'Îzedîn Mustefa Resul, *b.n.b*, r. 215.

[90] - 'Elaedîn Scadî , *b.n.b* , r. 215.

[91] - R. leç Şêrko *b.n.b*, r. 215 .

*Lora ku dmar xeyb felek bû*

*Tarîx hezar û şêst û yek bû*

*Îsall gehîşte çhil û çaran*

*Wî pêşrrewî gunahkaran*

Anku li sala 1105 kuçî ku dastana mem û zîn hatiye çêkirin li wî demî sala 1693zi bû, zêdetrî sed salan ku di navbera dû dîroka da di bît paşî di bêjît li sala 1952 mirye anku raman wesaye ku di vêt 61 salan piştî danana pirtûkê mirbît. Ligurî ş'ra wî bi xwe di jyê 44 salyê da pirtûka xwe çêkirye, bivê yekê jî jiyê wî 105 sal bûye.[92]

Emîn zekî beg li bara jiyana Xanî di pirtûka Dîroka Kurd û Kurdistan da di bêjît:

Bi duv axiftina mihît alm'arf keftye, di meşahîd alakrad jî da û li duza Kurdî jî behis di ket, wî bixwe çû hizir û bîrubawer nîn ka buçî berisva wî axiftina wî jî ye.[93] Bi buçûna gelek rojhellatnasan jiyana Ehmedê Xanî dkevîte destipêka çerxekê û hetaku dumahya ewî çerxî, bêguman ew çerxe jî çerxê hevdê zanîy bûye.

Herwesa li bara jiyana wî ligurî piranya çafkanyan Ehmedê Xanî li Bayezîdê ji dayikbûye, wesa diyare ku eve jiblî vê yekê liser zarê xelkî hatiye û li wê yekê jî hatiye ku Xanî li Bayezîda rojhelatê hatiye veşartin û gurê wî jî hêşta her mezargehê xelkî ye li wêrê.[94]

Li bara mirina Ehmedê Xanî dîsan çafkanyan jî cudahî keftînê, û eve marf xeznedar di bêjît:

Şa'êr li navenda ji daykbûna wî li bayezîdê li sala 1707zi çuye berdluvanya xudê , jiblî vê yekê belgeyek jî heye , piştevanya evê buçûnê bi risteyeka 'erebî di ket tarq Xanî alî rbe ku bo mirovbûna Xanî hatiye danan.[95] ‘Elayedînê Sicadî li bara

[92] - 'Elaedîn Sicadî , *b.n.b,* r. 215 - 216

[93] - Mhimd Rmîn Zkî R. eg , *Tarîx Alkird û Kirdistan* , R. ergê Qahîre , 1939 , r. i 216 .

[94] - 'Îzedîn Mistefa Resull , *Ehmedê Xanî* , r. 24 .

[95] - Marf Xeznedar , *b.n.b* , r. 368 .

kuçbarbûna Xanî di bêjît li sala 1706 dijyê 56 salyê da çuye berdluvanya xudê û her Bayezîdê jî hatiye veşartin, gurê wî jî niha her mezargehe.[96]

## 2.2. Çend Layek Ji Naveroka Berhemî Ehmedê Xanî

### 2.2.1. Xanî û Netewayetî

Demaku behsa hesta neteweyî ji aliyê Xanî ve dekeyn merem bitnê ew yek nîne , ku Xanî wek şa'êrek xewn û xuzî û hez li netewebûnê hebûye û vyaye ji destê dagîrkerên weku " rum û 'usmanî û farsî " rizgar biken , belku cîhan bi dîtineka zansitî evê yekê ku li gel jêwar û şyanên serdem derbkevît û li dema lêkdanê jî da bera xelkî bkevît , ev yek jî bo hizirmendî û lêhatuîy û dîtna rêberî ya meselê 11ê Xanî gewhera meseleya Kurdî ye li serdemê xwe da sereray hebûn û zalbûna dû împratûrên fars û 'usmanyan li hindek pişkên Kurdistanê ku bizava ji navbirina mîrgehên Kurdan dikir , şer berewam bû , mîrgehek ji nav dçû êka din di rust dbû , û turk û fars jî her liser dzalbûn eger Kurdistan ya êkgirtî baye , bi hizira Xanî çû zalbûn nedbûn.[97]

Di vî warîda Xanî di bêjît:

*Xalb nedbû li serme ew rûm*

*Ned bû xrabeyî  ddest bûm*

*Mehkûm û 'elîhu se'alîk*

*Mexlûb û wtî' turk û tacîk*[98]

Xanî li vêre bi rengekê rûn û aşkra rexne li reftarên Kurdan digrît / liser wê yekê ku em Kurd herdem djî hevdû buyne û lihember byanyan jî lawaz û bê hêzbûyne , eger husa nebayn bi buçûna Xanî çû caran rumê nedkarî bivî rengî liser me serbkevin , li vêre Xanî hesta nîştmanî û netewatyeka kuyr bikarînaye û mesela dagîrkirina Kurdistanê jî kar liser dilê wî kirye , di vê ş'rê da hekîmekê vyaye

---

[96] - 'Elaedîn Scadî , *b.n.b* , r. 220- 221.

[97] - Ehmedî Xanî , *b.n.b* , r. 22.

[98] - Ehmedî Xanî , *b.n.b* , r. 22.

amujgarya Kurdan û serkirdên Kurdan biket , ku serkeftna ruman ji egera xwe xrî û nakukyên wan bûye, eger ne çewa rûm dkarît neteweya wan kavil û dagîr biket .

Xanî liser vê mesela rêknekeftna Kurdan di nav xwe da diçît û li cihekê din da di bêjît:

*Lew pêkve hemîşe bê tfaqin*

*Daîm bi temerrud û îqaqin*

*Ger d ʰhebwa me îtîfaqek*

*Vêkira bi kra me înqya dek*

*Rom û 'ereb û 'ecem temamî*

*Hemyan jmera dikir xulamî*

*Tekmîl dikir me dîn û dewllet*

*Tehsîl dikir me'lîm û hîkmet*[99]

Xanî di bêjît me herdem pêkve nekarye bigehîne rêkeftnekê û herdem mijulê helweşandin û duberekyan bûyne , ji xwe eger em pêkve rêkeftbaye û pişta hevdû girtbaye li wî demî , hindî dewletên dagîrkerên mezinin da bne bin dest û bçûkên me û em jî da bîne Xudanên dewlet û da berdewamyê bi zansit û hîkmetan deyn , eger seha hemû ş'rê bi kîn , dê bînîn Xanî weku rexne grekê derkeftye û hemû necwanî û te'li û talên xrabên gelê Kurd diyarkirîne û bi hizira wî egera paşvemanûn û serinekeftin û nebûna deweleta Kurdî ji ber sedema xrabyên gelê Kurd bi xwe bûye , ji xwe eger em kuytir seha hizrên Xanî bi kîn dê bi daxve kêm û kasyan dyar keyn , daku gelê Kurd carek din pêdaçûnê dixwe da biketeve û hevdû bigrin , daku nebtinê li bin destyê rizgarbîn , belku dewletên dagîrker jî biçne bin xulamya ewan da , nek bitnê eve belku li cihekê din di bêjît:

*Ev rom û 'ecem bwan hesarin*

[99] - Ehmedî Xanî , *b.n.b* , r. 22 .

*Kirmanc hemî le çar kenarin*

*Her dû terefan qebîlî kirmanc*

*Bo tîmrî qeza kirdîne armanc.*[100]

Xanî bi rengekê zansitî ev dagîrkarya rûmê û cihê sitratîcya di navbera herdû împraturan destinîşan di ket ka çewa çav li Kurdistanê ye ya êkê ji ber sedema heza ewan dagîrkeran û ya dûyê jî ji ber sedema neguncyana Kurdan li gel hevdûye.

**2.2.2. Amajeya Încîlê Di Mem û Zîna Xanî Da**

Eger em li Mem û Zîna zanî bi kîn ew yek dê bume rûn bît ku Xanî bi rengekê rûn û aşkira mifa ji ayetên quranê wergirtîne di binekukirina deqên ş'ryên xwe da bi taybetî jî di Mem û Zînê da , xwandevanek çav li ewan ş'ran biket dê bêjît Xanî bitnê mifa ji quranê wergirtye û bitnê quran ya xwandî , belê ev yek heta astekê raste , ji berku eger deqên Xanî hemberî deqên nicîla pîroz bikey ew yek dê bume aşkra bît ku Xanî jiblî quranê , încîl jî ya xwandinî û liser wî kartêker bûye , ji bervê dhindek Cihan da merema ş'rî ya wî nêzîkbûye ji ncîla pîroz , ev yek jî hizirmendî û blîmetya Xanî diyardi ket , ku Xanî kesekê rewşenbîr bûye û mêşkekê berifireh hebûye û nek bitnê quran xûn û nîv melayek bûye , belku bawerî ya temam bi hemû ulên din jî hebûye herweku Xanî di bêjît :

*Ew jî ku bezîyne wê hewarê*

*Wî muthîmî wa gote yarê*

*Tajdîn te dî çi reng eda kir*

*Musa li me behra em zukra.*[101]

Ev herdû rêzên helbestên Xanî amajeyeke bo êk ji ayetên tewrata pîroz dyar di bît ku di bêjît:

[100] - Ehmedî Xanî , *b.n.b.* r. 34

[101] - Hecî Ce'fer , *b.n.b.,* r. 143.

Dema ku musay destê xwe li avê dayî, hewayek li rojhelatê hat, û hetaku serê sbê ya berdewam bû, paşî derya şeqkir û rêyek di nava deryayê da vekir herwesa ev herdû rêzên ş'rê di qurana pîroz jî da amaje bu hatiyekirin.

Xanî di bêjît:

*'Eşq agre ten çyayê gur*

*Dil ew şecera bi nar û nore*[102]

**2.2.3. Xanî û Pesna Pêxemberî**

Xanî di pişka dûyê û sêyê ya mem û xînê terxankirye bu wesfa pêxemberî, û dvan herdû pişkan da ku li bara pêxemberî ye hizreka quranî û pesna şa'îrane pêxember têda dihête diyarkirin, weku çewa pêxember hebûneka nû di rustkirye û li dem û cihekê taybet da peyama pêxemberî bicihkirye, bi heman reng Xanî ev hizre bivî rengî derdiçît:

*Ew pencereya cemalî barî*

*Şemsa feleka dllêd tarî*

*Gava kete suretî cîhanî*

*Pêxemberî axir zemanî*

*Wî burzuxî mumkînatî wacîb*

*Wî padşahî ji şeklî hacîb*

*Mensux kirin wî dîn û mîlet*

*Me'lum kirin 'elîl û 'îllet*

*Fekrî ku cîhan cemî'î kufire*

*Kêşa ji nibweta xwe sifire.*[103]

[102] Hecî Ce'fer, *b.n.b,* r. 142

Li bara wesfa pêxemberan jî ji aliyê şa’êr û 'arf û sofyan ve nîkilsun di bêjît li vêre wêve Mihemed ( s.l.x ) hate binavkirin bi rûnahya xudê di bêjît berî di rust bûna kewnî hebûye û di nava pêgehê wîda ew yek heye ku bnekuka hemû jiyanê ye û hebûye û dê hebît jî , ew mirovê kamil û temame ku hemû saloxetên Xudayî têda rengvedayne û dvegêranên sufyekan jî da evê fermûdeyê pal di dene ber wî ewê ku min dbînît , xudê dbînî.

Xanî, bilez deçîte ser wêneyê dûyê yê melay ku di bêjît wek hebûneka nû di rustikrî û li dem û cihên taybet da peyama pêxemberî, temam zansit bce înay.[104]

Li vêre Xanî keftye dpesna pêxemberî û pestên ewan karan di ket ku wî kirîne û di bêjît ew pişkeke ji rûnahya xudê û taryatya dil û derûnê me kirye rûnahî dema ku hatiye cîhanê dît ku cîhan hemû şeplî û nerêk û pêke, dest kir bi bangixwazya baş û bawerî ya rast û di rust bo mirovatyê, hetaku ew nedadperwerî û nerêk û pêkî ya heyî ji nav bi bet

#### 2.2.4. Xanî û Evîna Xwudê

Eger em çav li ewan nivîsînan bi kîn yên ku li bara mesela tesewfê hatîne nivîsan , behsa evîna xudê di çêrokên evîndaryê da ji aliyê sufyan ve cuda hatînekirin belê ji ber sedema ewê têkelya di navbera dû beHisên jêkcuda ji aliyê Xanî ve me paldi det , ku mesela eşq û êkbûn û gehiştin û çêrokên evîndarî bi êk mesela nav êkdaçûnê bdanîn ku li gel babetê selsefî û sufên din jî da têkel di bît , li vêre jî ji bo selmandna vê yekê me mînayek ji bo rjandna vê yekê pêdivî ye ku bêxîne berçav.

Xanî ew çîrokên evînyê ku ji aliyê gelan ve zanîne û vegêrayne û bi çîrokeka êkgirtî zanye ku di evîna xudê da dihêteder, Xanî dmunacata Xudayî da di bêjît:

*Şrîn tekre ekir li perwêz*

*Ferhad ji rengî eşk xûn rêz*

*Leyla tekre bella li qeysî*

---

[103] - Hejar Mukrayanî , *b.n.b., r.* 6.

[104] 'Izedîn Mistefa Resul , *b.n.b., r.* 425 .

*Ramîn bi teram bû li weys*

*Îwsif teçra numa zu leyxa*

*Wamîq tekosa ghande 'ezra*

*Şêxê weku pênce hec bjarî*

*Dîn girte ji bo Kiça kufarî*[105]

Li vêre Xanî hindek dastan û çîrok ji aliyê gelên din ve înaye û bi çêrok û dastanên êkgirtî danayine, wî bixwe di munacata li gel xudê da bikarînayne.

Li bara behisên ruh û gyanî li cihê evîniyê , û dil li cihê zanînê digrin , nhênî li rûh û gyanî cwantre û gyan li dilî şerîftre , sufyên din destkirye bi lêkdaneva dil û helac di bêjît:

*'Qid alinbwe mêbah min alnur*

*M'liq aluhî mişkae tirrmur*

*Balle îniftih nfix alruh fî xildî*

*Lxagrî nfix/ sirfîl fî alêwr*

*Aja ticlî bgurî rin îklimnî*

*Rrrîn fî xîbtî musî 'lî algur* 106

Hemû ew raman û wênên ku ji aliyê helacî ve di hêne diyarkirin, dîsan ji aliyê Xanî ve dûbare di bneve û di çend rêzekan da hemû hatîne bikarînan.

*'Eşq agre, ten çyay gûre*

*Dill ew cerab naru nuwe*

*Mîşkate qefes qebes çraye*

[105] - Ehmedê Xanî , *b.n.b* , r. 20 - 21 .

[106] - Kawl Mêgfî Alşîr, *Dîwan Hacî* , R. bixda 1974 , r. 31.

*Can zeyte ftîlî wî cefaye*

*Dil şûşeye ew çra dû nave*

*Sirr cuze kulîda bllave*[107]

Ligorey hizir û bîrên 'zedîn mestefa resul ew nmûnên ku Xanî bikarînayn bi temamî li gel lêkdaneveyên sufyaneyên ku ew ayetên quranê bixuve digrin rûnahya xudê bi çrayî ve şubhandîne .

Ellahu nur elsemawat welerz misil nure kimişkae fîha kîsbah ealmîsbah fî zecace.[108]

Anko Xudê ronahya erd û esmanane " anko ewe yê erd û esman rûn di ket " metela runahya xudê " di dilê bendeyê Xudan bawer " wekî kulekekê ye " di dîwarî da û ya nevekrî " û çrayek têdabît , ew çraye di şuşeyeka zelal û geşdada bît

Mişkat ya qebax - perda dilî ji aliyê ewan ve dil Xudan bawerî ye, axftinên wî jî rûnahî ne û di nav rûnahyê da diçît.[109]

Nimûna Xanî dûbarekirina nmûna quranê ye bi temamî, û ew nmûnên ku li çend cihekên din jî dûbare di ket, anku ul û quranê kartêkirineka temam liser Xanî kirye û herdem kirye bnekuk û çafkanyeka giring bu avakirina deqên xweên ş'rî.

### 2.2.5. Amajên Quranê Di Nav Mem û Zînê Da

Bi hûrbûnî û berêXudan ji bû Mem û Zîna Ehmedê Xanî ew yek dê bume rûn bît ku , Xanî sereray wê yekê ku şarzayeka baş di warê jiyana civakî û evîna xudê û hikmet û dana hebûye , û di warê êş û anên Kurdayetî û duzra Kurdan jî da hebûye , dîsan di warê ul û sufîgerî û 'rfanê da dîsan , kesatyekê bnav û deng bûye.

Guman têda nîne , ku Xanî ji aliyê ulî ve zor şareza û rewşenbîr bûye , bi taybetî di warê sufîgerî û 'rfanê da , ev yek jî bume di huyirbûn û bînîna Mem û Zînê da dyardibît , ku şarezayeka baş di qurana pîroz da hebûye û bo vê meremê jî mifa ji

107 - Ehmedî Xanî , *b.n.b* , r. 77.

108 - *Nur/* 35.

109 - ‘Izedîn Mistefa Resul , *b.n.b.*, r.432.

ayetên qurana pîroz da wergirtîne bo bnekuka deqên xweyên ş'rî , dema ku mirov di naveroka Mem û Zîna Xanî da bi huyrî sehketê dê ew yek bu dyar bît ku Xanî zanyaryên baş hebûyne , ku di karîn bêjîn hemû quran ji berkirye , yan jî pişkeka baş ji berkirye , ji berku di bnekuka deqên wyên ş'rî da derdi kevin , û li bara evî tewerî.

Xanî di bêjît:

Emir teye le fvî kin dû 'alem

Mucud kirin, xirç çi adem

Adem bixwe yek ji her duwane

Yek herf ji emir kin fikane.[110]

Ev herdû rêze amajê bi ayeta

(وَإِذْ قُلْنَا لِلْمَلَائِكَةِ اسْجُدُوا لِآدَمَ فَسَجَدُوا إِلَّا إِبْلِيسَ أَبَى وَاسْتَكْبَرَ وَكَانَ مِنَ الْكَافِرِينَ) سورة البقرة - اية 34[111]

34- Wê demê me ji firîşteyan(me - Layîketan) re got Ji Adem re herin sicûdê Ji bilî Ibıl'ıs hemû jê re çû ne sicûdê Ew neçû sicûdê wî xwe mezin dêra û (ji ber vê yekê) ew bû ji kafiran

[112]إِنَّ مَثَلَ عِيسَى عِنْدَ اللَّهِ كَمَثَلِ آدَمَ خَلَقَهُ مِنْ تُرَابٍ ثُمَّ قَالَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ) سورة آل عمران- اية 59

59- Bêguman li cem Xwedê rewşa Îsa wekî rewşa Ademe Xwedê ew (Adem) ji axê afirand Piştre jê re got çêbe Vêca ew jî şêbû.

*Wî sicd nekir li xîrî me'bud*

*Gîrate ji ber derê xwe mer dud*

---

[110] - Ehmedê Xanî , *b.n.b.,* r. 25

[111]- *En'am/* 73 .

[112] - *Al 'Imran/* 59 .

*Yek sicde nebir li pêş exyar*

*Qihrate kre m'lid alnar*[113]

Anko ev herdû rêze amajê bo çîroka ademî diken, dema ku Xudayê mezin adem afirandî û gutye hemû firîşteyan bo herine sucdê, hemû firîşteyan sucde bo adem brî bitnê şeytan nebît.

Herweku Xudayê mezin di bêjît:

(وَهُوَ الَّذِي خَلَقَ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضَ بِالْحَقِّ وَيَوْمَ يَقُولُ كُنْ فَيَكُونُ قَوْلُهُ الْحَقُّ وَلَهُ الْمُلْكُ يَوْمَ يُنْفَخُ فِي الصُّورِ عَالِمُ الْغَيْبِ وَالشَّهَادَةِ وَهُوَ الْحَكِيمُ الْخَبِيرُ) سورة الأنعام - سورة 6 - اية 73[114]

73- Her ew e yê ku erd asîman bi heqî afîrandine. Roja ku ew bibêje Çêbe vêca çêdibe Gotina Wî her raste. Roja ku di sûrê (boriyê) de bête pifkirin jî, Xwedanî her jê re ye. Zanayê bi ya nependî û bi ya aşkera ye. Her ew e yê êkim yê Xebîr

( وَإِذْ قَالَ رَبُّكَ لِلْمَلَائِكَةِ إِنِّي خَالِقٌ بَشَرًا مِنْ صَلْصَالٍ مِنْ حَمَإٍ مَسْنُونٍ، فَإِذَا سَوَّيْتُهُ وَنَفَخْتُ فِيهِ مِنْ رُوحِي فَقَعُوا لَهُ سَاجِدِينَ، فَسَجَدَ الْمَلَائِكَةُ كُلُّهُمْ أَجْمَعُونَ، إِلَّا إِبْلِيسَ أَبَى أَنْ يَكُونَ مَعَ السَّاجِدِينَ) سورة الحجر - اية 28، 29، 30، 31.[115]

28- Wê demê Xwedayê te ji firîşteyan re got, bêguman Ez ê ji heriyek hişk û hola, ji heriyeke reşeguherî mrovekî ( Adem) biafirînim.

29- Dema min ew tekûz kir û min ji ruhê ku mexlûgê min e puf kirê vêca di cih de hûn jê re herin sicûde.

30- Firîşte tev bi hev re ( ji Ademî re) çûn sicûde

31- Lê belê Îblîs bêemrî kir û nexwest ku bibe digel cecdebiran.

Eger seha naveroka evan herdû ayetên pîroz bi kîn û paşî hember bi kîn bi hizir û bîrên şêraneyên Ehmedê Xanî ew yek dê bume dyarbît ku Xanî bitnê hizrên ayetan wergirtîne û bnekuka ş'rên xwe pê avakirîne, li vêre şehrezayî û aşnabûna

---

[113] - Ehmedê Xanî , *b.n.b.,* 26 .

[114] - *Alak/* 116.

[115] - *Alhicir/*, 28 - 29 - 30.

Ehmedê Xanî diyardibît ji berku ew hizir û bîr bi rengekê cwan û balkêş danayne, ku bi temamî tameka edebî ya giring bi hizira ayetê daye, bi rengekê ku xwandevan nkarît rexnê li Xanî bigrît û bêjît Xanî bitnê hizira deqa ayetê kupî kirye.

## 2.3. Di Navbera Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Memê Alana Foliklorî Da

#### 2.3.1. Kesayetî (Qehremanî)

Mem û Zîna Ehmedê Xanî ji rûyê kesanên qaremanan ve hev nêzîkyeka zur li gel Memê Alana foliklorî heye, hemû ew kesên ku di nava Mem û Zîna Ehmedê Xanî da heman ew kesn ku di nava Memê Alana foliklorî dane bitnê çwar kes jwan nebît , herweku ku dê li xwarê amajê bo keyn.

Qaremanên Mem û Zîna foliklorî evene:

1 - Mem: Kurê Paşa Yemen.

2 - Zîn: Kiça 'Ebdal (Ebdal) û Xuşka Paşa Zeynedînê Paşayê Cizîra Botan.

3 - Xdir û Elyas (Xidir Elyas): Pêxember.

4- ‘Ebdal (Ebdal) : Babê Zîn û Paşayê Cizîra Botan.

5 - Zêndîn: Kurê Paşa 'Ebdal û Birayê Zînê.

6 - Bekir (Beko): Zelam û Karbdestê Zêndîn.

7 - Gurgîn: Hevalê Memuîy.

8 - Ceku: Hevalê Memuîy

9- ‘Arf: Hevalê Memuîy

10 - Bengîn: Bengo, Hevalê Memuîy

11 - Stî: Xuşka Zînê.

12 - Qere Tajdîn: Wezîrê Paşa Zêndîn.

13 - Melek Rehan: Xuşka Bekir (Beko) î.

**Qaremanên Mem û Zîna Ehmedê Xanî**

1 - Mem: Kurê Mîrza (Debîrî) Dîwanvanê Paşa Zêndîn.

2 - Zîn: Xuşka Paşa Zêndîn.

3 - Zêndîn: Paşayê Botan.

4 - Bekir: Karbdest û Dergehvanê Paşa Zêndîn.

5 - Gurgîn: Hevalê Memuîy. Û Serokê Zêrevanên Paşa Zêndîn.

6 - Stî: Xuşka Zînê.

7 - Tajdîn: Hevalê Memuîy. Û Kurê Eskenderê Wezîrê Paşa Zêndîn.

8- ‘Arf: Navê Êk Ji Birayên Tajdîne .

9 - Heyzeyûn: Dayka Zînê.

10 - Çeko: Navê Êk Ji Birayên Tajdîne.

11 - Xidir: Pêxember.

Li vêre eve yek bume dyar di bît, ku çêroka Mem û Zîna foliklorî hemû ew qaremanin ku di Mem û Zîna Xanî da , dûbare bûyne . Jiblî heyzebûn dayka zînê , li gel sê kesanên din , ku di Mem û Zîna Xanî da nahêne dîtin.

1 - Ebdal: Babê zînê û zêndînê paşayê cizîra botan , tnê navê wî hatiye , belê rulekê serekî nabînît.

2 - Bengîn ( Bengo ) : Hevalê Memuîy

3 - Melek Rehan: Xuşka Bekir ( Beko )î.

Bi hemberkirina herdû deqan , raman ewe ku deqa mem û xîna foliklorî û Mem û Zîna Ehmedê Xanî ew yek bume rûn bû , ku Xanî mifa ji xala cewherî ya Mem û Zîna foliklorî wergirtye û kirye êkgirtnek û nehêlaye ji nav bçît çunkî serhatî di edeba milî ya ser zarî belave , li gelek ji deverên cugrafyên Kurdistanê bi dyalêktên jêkcudayên zimanê Kurdî , herwesa Xudanên hekayat û sitiranbêjên Kurdî bi pexşan gutîne û bi sitiranan qîrandîne , vegêranên wesayên drêj têdane hene şevên zistanekê pêdivî ye hetaku bi dawî bhêt , û yên wesa jî têda hene sitiranbêjek dmaweyekê kurt da dkarît ruydanên wê vegêrît .[116] Hemû ev zanyarye buyne amrazek bi destê Xanî û ewî jî xzîneyeka bi bha û cwan jê vehandye, eve sereray parastina wê.

Her li bara dabeşkirina kesatyan da Hecî Ce'fer di bêjît:

| Mem û Zîna foliklor | Mem û Zîna Xanî |
|---|---|
| Mem | Mem |
| Tajdîn | Tajdîn |
| Çeko | Çeko |
| 'Arf' | Arf |
| Stî | Stî |
| Zîn | Zîn |
| Paşa Zîndîn | Paşa Zîndîn |
| Beko | Beko |
| Gurgîn | Gurgîn |

[116] - R. u Pêzanîn Zêdetir Seha 1 – Hejar Mukiryanî , Mem û Zîna Xanî , Temamya Têksitê , Li Gel Mem û Zîna Foliklorî , Seha Mem û Zîn Destinvîsa Hijmar R. i 2514 Ya Namxana Amojgarî Ya Rojhellat Nas Ekadîmya Zansitî Sa Sovyetî , Ko. Kulîja Eder. yat , Hijmare 16 , Sala 1973, Rudînko , Mem û Zîn , Mosko , Sala 1962 , Mem Û Zîn , Hewlêr , R. ergê Êkê , Mukiryan ,

| | |
|---|---|
| Zaruyê Stî Û Tajdînî | Zaroyê Stî Û Tajdînî |
| Sê Perî | Pîra Heyze Bûn |
| Xdir Alyas | Xidir Nebî |
| Babê Memuy | |
| Bengîn | |
| Wezîr | |
| Sê ، yaxdam | |
| Çawîşê paşayî.[117] | |

Herwesa hecî ce'fer li bara tevgera kesatyan di bêjît heke seha kesatyên Mem û Zîna Xanî bi kîn, dê bînîn ew kesên ku di Mem û Zîna foliklorî da hatîn , dê bînîn ku şeş kesn , û rulê wan jî gelek kême ku ew jî sê perî , babê memuîy , wezîr , bengîn , stî ya xulam û çawşê paşayne.[118]

**2.3.2. Zîn û Stî**

Di Mem û Zîna foliklorî da Zîn û Stî xuşkên paşa Zeynedînin û di Mem û Zîna Xanî jî da heman kesn .

Mem û Zîna foliklorî

*Deste bran di bêjin ew xatû zîne*

*Kiça mîr 'ebdele û xîşka mîr zeêndîne*[119]

*Mem û Zîna Xanî*

[117] - Hecî Ce'fer , *b.n.b* , r. 171 - 172.

[118] - Hecî Ce'fer, *b.nb.,* r. 172.

[119] - *Govarî Kulîja Edebe*, j 16 , r. 74.

*Şehzade bûn lêk wî nihanî*

*Xurşîd du bûn lêk wî mahî*

*Yek seruy ryaç rastî bû*

*Wê nanî brastî s êbu*

*Yad dî ji dil û hnavî mîr bu*

*Wê naq ji nsfê navê mîr bu.*[120]

Hemberkirina herdû deqan ew yek dê bume rûn bît ku stî û zîn xuşkên paşayê butanin, Ehmedê Xanî jî bi heman şêwe di Mem û Zîna foliklorî jî da stî û zîn kirîne xuşkên paşayî.

#### 2.3.2. Qaremanên Serekî

Di herdû deqên Xanî û foliklorî da Mem qaremanê serekyê çîrokê ye û destgirtyê zînê ye, pêdivî bi belgeyan jî naket, ji berku xwandevan bi aşkirayî hest bi vê yekê di ket.

#### 2.3.4. Zîn Şanazyê Bi Her Sê Birayên Xwe Deket

*Mem û Zîna foliklorî*

*Deste bran di bêjin ew xatû zîne*

*Kiça mîr 'ebdele û xîşka mîr zêndîne*

*Memal û taqet le gel wê nîne*

*Eger te bivêt wêbo tebera kirmancek şirinye*

*Eger ewan dêbi zerya şîrê xo ştîne*

*We mnet ji kesê jî em ne helgirîne.*[121]

[120] - Rudînko , *b.n.b.*, r. 95.

*Di Mem û Zîna Xanî jî da*

*Tacdîn di gotin**ê** cwanek*

*Gu derzî zemane pehlewanek*

*Nsil û nisb û hbis 'eyan bu*

*Ser defter û serwer giran bu*

*Bab**ê** wî di gotin**ê** skinder*

*Lêkin 'ereban dgu xiçnifhir*

*Lew ra ku bşîrî şil'î şêr bu*

*Roj şer ew hizar mêr bu*

*Tacdîn du bra her bun dqelaş*

*Matdî du şahbazî cemaş*

*Dtim dell ĩdujimnan dsutin*

*Yek 'arf yek çeku di gutin.*[122]

Bi hemberkirina herdû deqên Xanî û foliklorî ew yek bume rûn di bît ku Xanî mifa jdeqên foliklorî dîtîne û kirîne bnekuk bu deqên xwe

#### 2.3.5. Beko

Di Mem û Zîna Xanî da, Beko xelkê devera merge vre, ku dekevîte jêrya rojava êranê, ji aliyê Xanî jî ve bi heman tişte.

*Bekrokê mer gewerî li kulan ĩma bu*

---

[121] - Ko. Kolîja Edebe , j. 16 , r.  74.

[122] - Rudînku , *b.n.b.*, r. 50.

*Sirrra mem û zîn wê aşkera bu.*[123]

*Mem û Zîna Xanî*

*Ehsllî wî dbîn ji merge ver bu*

*Mihta wî beşrî bi şor wşirr bu*

*Navê wî mnafq bkir bu*

*Belke j bluqya be ter bu*[124]

**2. 3. 6. Gurgîn**

Di Mem û Zîna foliklorî da gurkîn gazyekê bo layê sê birayan deket, ku di hana memuîy ve biçin, ji aliyê Xanî jî ve heman tişte.

*Mem û Zîna foliklorî*

*Yek ji bran navê wî gurkîn*

*Fî alhal cwab ghande qere tajdîn*

*Were xoda kuştin ew memê dîn*[125]

*Mem û Zîna Xanî*

*Ser darê goran bi navê Gurgîn*

*Fî alhal xeber gehande tacdîn*[126]

[123] - Rodînko , *b.n.b* , r. 96.

[124] - Rodînko , *b.n.b.,* r. 128.

[125] - Rodînko , *b.n.b.,* r. 84.

Sereray evan jêkçûnan, çendîn jêkçûn û hizir û bîrên din yên dûbare di navbera ewan herdû deqan da di hêne dîtin, belê me nevên zêdetir liser biçin, çunkî dê ji babetê serekîyê xwe derçîn, ji bervê me bi pêdivî zanî bi rengekê kurt evî babetî behis bi kîn.

**BEŞA SÊYEM**

**3.RENGVEDANÊN FOLIKLORÎ DI MEM Û ZÎNA EHMEDÊ XANÎ DA**

### 3. 1. Dastan

Dastan bi rengekê giştî hemû ewan behis û rûydan û babetan bxuve digrît, ku di kevin da, anku ji mêjda hatîne rûydan û cîl bo cîlî hatîne veguhastin, hetaku gehiştye evî serdemê niha rûydanên nava Dastanan mezintrîn rûydanin, ku di bît di nava Dîroka Gelan da hatbne rûydan, ji bervê nabît bi çû rengan bi sadeyî seha dastanan bi keyin[127]. Hindek caran rûydanên nava Dastanê bi rengekê sade derdi kevin, belê di resen da di naveruka rûydanên Dastanê da merem û armancên kuyr hene, ew rûydan jî rûydanên mezinin ku ji layê kesekê ve di hête encamdan, ku hêza wî zêde zore.[128] Hindek caran rûydanên nav Dastanê behis li Evîn û Qurbanîdana di navbera dû kesan di ket, ku zêde Qurbanîdan têda encamden daku bi hevdû bigehin Dastana Evînya Kurdî li pal sûz û hest û vyan û wefadarî û rastguyê da bi rengekê pehlewanî û gyan fîdayî derêxistye.[129] Yan jî behis li Şoreş û Şer û Azayetya pehlewanan di ket, bo mîna Dastana kelha Dim dim ev Dastane di nav Kurdan da bi rengekê wesa belavbûye, ku rhên rastyê di hizir û wijdana hemû Şa'êr û Nivîserên Kurda brîne xwarê.[130]

Ehmedê Xanî weku her Şa'îrêkê din mifa ji Dastana Foliklorî wergirtye û kirye binekuka ş'rên xwe.

---

[126] - *Ko. Kolîja Edebe* , j.16 , r .81.

[127] Şehla Kerîm Hesen , *b.n.b.,* , r.45 .

[128] Şehla Kerîm hesen , *b.n.b.* , r.45

[129] Eskender Selîm Mzîrî *, Lêvekollînek Le Ser Dastana Sitratîjê Foliklorî* , Govara Asoya Foliklorî , Hijmare 5 Temûz 2001 , r.25.

[130] Cudt Hoşyar , *Jxar Altras Alkirdî Fî Xrab Bgir Surx , Alimgib'e Karwan* , Arbîl 2011, r.52.

### 3.1.1. Dastana Rostem û Zorab yan jî (Rostemê Zalê)

Xanî di bêjît:

*Muhtacê sexawe tawî hatem*

*Mexlûbê şeca'eta wî Rostem.*[131]

Ehmedê Xanî di deqên xweyên ş'rî da Dastan bi rengekê duyr û drêjî neveguhastîne , belku bi şêwazê Remiz - Amaje û bitnê bi nav û hindek caran jî behis li saluxetên Pehlewanan kirye , ji bervê di vê dêra ş'rî da bitnê weku remiz û amajeyek behsê azayetî û pehlewanya Rostem î kirye. Rostem pehlewanekê nava Dastanaye , êke ji pehlewanan ku li l gel wî herdem Zorab , yan jî Zal di hête dîtin , di hête gutin ku Rostemî hêzeka zêde hebuye , çû kesan neşyayê.

### 3.1.2. Dastana Wamîq û 'Zra:

Dastana Wamîq û 'Zra Dastaneka Foliklorî ye û di nava hendek Gelên jêkcudada di hête dîtin, di nava Gelê Kurd jî da ev Dastane bi çend pîverên jêkcudada di hête dîtin, Dastana 'Ezra û Wamîq ji layê Ehmdê Xanî ve Cihekê dyar heye û Ehmedê Xanî dçendîn Cihan da amaje bi vê Dastanê kirye:

Xanî di bêjît:

*Ew her dû cwan we lêk di 'Aşq*

*E her dû bra we pêkve êadq*

*Yek Qeysê zemane yêk Leyla*

*Yek Wamîqê 'esr û yêk 'Erza.*[132]

Di nava edebyatên Folikloryên Kurdî da çendîn Dastanên Dildarî û Evînî di hêne dîtin êk ji wan Dastana Dildarî û Evînî û Fîdarkarya Qeys û Leyla , Wamîq û 'Ezraye herwekî çafkanyên Foliklorî vedguhêzn ku Dastana Qeys û Leyla êke ji

[131] Tehsîn Îbrahîm Doskî , *b.n.b.,* , r. 71.

[132] Tehsîn Îbrahîm Doskî , *b.n.b.,* , r. 85.

Dastanên Dildarî û Evînyên Fîdakaryên kêm wêneyên Gelê Kurd , naveruka Dastanê ewe ku Qeys bo Leylayê dîn û harbuye û keftye çul û Çiya , ev yek jî ji ber sedema Cwanya Leylayê bûye , li bara Wamîq û 'Ezra jî herdîsan herdû bu hevdû Evîndar buyne , hetaku radeyê Gyanfîdayê bizav bu geştna hevdû krîne , Ehmedê Xanî jî hatye û heman Dastana Foliklorî wergirîte û kirye bnekuka ş'rên xwe , belê Xanî bitnê bi şêweyê ( Remiz - Amaje ) karên xwe encam dayne , anku bitnê amaje pêkirye , ew jî saluxetên rul gêranên nava Dastanê wergirtîne û vyaye herwekî wî demî ewan zarveker û karekteran weku zarveker û karetkterên Mem û Zînê bi bha bdanît , di piştra vyaye wê yekê jî bêjît nek bitnê ev Dastane , belku me Dastanên din jî hene û berdewam Dastanên zêndî di nava Gelê Kurd da di hêne serhildan û Dastan jî liser rolên camêrî û dil paqjî û sûz û neşkandna peymanan di hête avakirin , anku Xanî layekê din yê reftar û rewşitê Gelê Kurd bume şluvedi ket , ku ev yek jî merema rûn û dyar ya Xanî ye di nivîsîna dastana Mem û Zînê da.

#### 3.1.3. Dastana Leyla û Mecnun

Leyla û Mecnun , dû pehlewanên nava dastana rojhellatê ne , Ev dastane dastaneka foliklorî ye , naveroka dastanê jî pêkdihêt ji evîn û fîdakaryeka rasteqîne , çafkanya evê dastanê li gurî çafkanyan gurankarî bi serda hatîne , Hindek di bêjin ev dastane , dastaneka foliklorî ya farsî ye û hindek jî di bêjin li deverên 'erebî bûye , ji bervê dastaneka 'erebî ye , Kurd jî di bêjin di nava Kurdan da ya berbelave , Ji bervê ev dastana foliklorî , Dastaneka Kurdî ya resene , Ev dastane bixwe jî behis li cwanya leylayê di ket , Ku cwanya wê buye sedema wê yekê ku mecnun bu dîn bi bît û bkevîte çul û çya , hindek çafkarî debêjn mecnun û qeys pehlewanin û herwan jî êk rul heye û Ehmedê Xanî jî mifa ji evê dastanê wergirîte û ji ber giringî ya evê Dastanê dçendîn Cihên Mem û Zînê da amaje pêkirye , Ev yek jî ji ber sedema giringî ya wê bûye.

Ehmedê Xanî di bêjît:

*Ew meyl ko dê bket we meftûn ?*

*Ew Leyl ko dê bket we mecnun?*

*Mecnûn ku nebin 'edîlla Leylê*

*Leylê ko di ket bi Leylê meylê?*[133]

Li vêre Ehmedê Xanî mifa jvê Dastana evînî û Foliklorî wergirtye û kirye bnekuk bu deqên ş'ryên xwe, dyare bi buçûna Ehmedê Xanî ev dastane dastaneka Foliklorî ya Kurdî ye, eger ne buçî hinde di Mem û Zînê da behiskirye? , Ev yek jî bu wê yekê dzivrît ku Ehmedê Xanî vyaye ev dastana di nav xelkî da belav buy û ji navçunê biparêzît.

#### 3.1.4. Xusr û Şîrîn yan jî Ferhad û Şîrîn

Ev her dudu zarveker û karektere , ji wan zarveker karkterên herî dyarên nava dastana Foliklorî ya Kurdî ne , ku nûşana Qaremanî û gyanfîdayî ye di Eşq û Evînyê da , di nava Farsan da wesa belavbûye ku ev Dastane Dastaneka Farsî ye û di nava 'Ereban jî da bi heman şêwe wesa belav bûye ku di bêjin ev Dastane Dastaneka Evînî ya 'Erebî ye , belê ev Dastane di deverên Kurdistanê Rûydaye û hemû reftar û zarveker û karekter û navên wan Kurdî ne , ji bervê nivîserên Folikloryên Kurdî di bêjin ev Dastane bi temamî Dastaneka Kurdî ye , Dastan jî behis li Evîna di navbera Xusr yan jî Ferhad û Şîrîn ê di ket , ku cwanya Şîrînê wel Ferhadî kirye ku dîn bi bît û şeydayê wê bi bît , belê bab û malbata Şîrînê berhev nebûn Şîrînê bden Ferhadî , bo vê meremê jî mercên gran danayne ber Ferhad , daku nekarît bce bket , duvda her ji layê malbata Şîrînê ve di hête belavkirin ku Şîrîn mirye , duy demî da Ferhad jî mjulê kulîna Çyayê Bîstûne , ji Ji nîşkekêve gweh li evan peyvan di bît , Tevrê xwe ku çil mena grane bu Esmanî blind di ket û duvda xwe pê Dikuje , herwesa vedgêrn ku Ferhad ji ber sedema evîna Şîrînê Çiyayê Bîstûne li Kurdistana Rojhellat di kete dû parçe û Avê di nava Çiyayî da dbete Gund û mala Şîrînê , anku ev Dastane Dastaneka Evîndarî ya Foliklorî ye , Ehmedê Xanî bizav kirye ku Cihê evê Dastanê di nava Mem û Zînê da bket , ji ber sedema wê îkê ku Fîdarkarî di nava Şîrîn û Ferhad da heye , bvî rengî Ehmedê Xanî vyaye cudahyê di reftarên Mem û Zîn û Ferhad û Şîrînê da bket , , yan jî wî di vêt bêjît ku di nava Kurdan da herdem Dastanên bvî rengî dberdewamin û Kurdan di babetê Eşq û Evîndaryê da çendîn Dastanên Evîndarî û gyanfîdayî hene.

Ehmedê Xanî di bêjît:

---

[133] Tehsîn Îbrahîm Doskî, *b.n.b.,* r.123.

*Xusre û nebûya swarê seydnîr*

*Şîrîn le şekir di bûye Peruyz*

*Ferhad çewa sur şikê pur xûn*

*Neyna nedidî swarê gulgûn.*[134]

**3.1.5. Dastana Şêxê Sen'an**

Dastana Şêxê Sen'an û Keça Gawrî Kafrî , ji Dastanên herî cwan û dilxuşkern ev Dastane Dastaneka Evînî ya Foliklorî ye , êke ji Dastanên kevnarên Gelê Kurd , naveroka evê Dastanê pêkdihêt ji Evîndaryeka rasteqîne , Zarveker û karekter û Qaremanê wê jî Şêxê Sen'an û Keça Gawrî ne , Şêxê Sen'an êke ji kesatyên Uldarên navdarên serdemê xweye , ev Şêx ( 50 ) caran çuye Hecê û 500 Murîd û Qutabî hebuyne û 84 Salan jî jyaye , piştî evan hemû Hec û evê hijmara zora Murîdan , Aşqê keçke Garwekê di bît , duvda Keç jî di bêjîte wî ez dê bi wî rengî li gel te rêk kevim ku tu bibye Gawr û Areqê ve bi xuy û Şemlikê bi drînî û bhêye Dêr û Kensê , Şêx jî ji ber evîna wê hemû daxwazyên wê bce di ket û êk bi êk ya wan daxwazyan encam ddet , duvda kiç jî bi şêxî razî di bît , belê li dumahya jyê xwe carek din Şêx û Keça Garu dibne Musilman , ev Dastana Foliklorî di nava edebyatên Kurdî da zor ya berbelave û pişkeka zur ya Şa'êran di nava deqên xweyên ş'rî da bi karînaye û bi remzê evînyeka paqij û rasteqîne Wesf di ken Ehmedê Xanî jî weku her Şa'êrekê din mifa jvê Dastanê wergirtye û kirye bnekuk bu deqên xweyên ş'rî , dyare Ehmedê Xanî bi rengekê Remzî ev yek bi karînaye , belê meremeka kuyr dipişt evî babetî ve di hête dîtin , Ehmedê Xanî di vêt wê yekê bêjît ku Eşq û Evînî dem û ce û jîyekê dyarkirî nîne , eve zêdebarî wê yekê ku Uldarî û pleyên Civakî nkarn rêgiryê li Eşqê bi ken , eve çi hêbetî buneke kesekê weku Şêxê Sen'an dijyê xweyê dumahyê da zêdebarî ku pleyeka cvakî û uldarî heye , belê li ula xwe duyirkeftî ye û di bîte gawr ji ber Keçeka Gawr , eve ji layekê ve ji aliyekê din ve Xanî di vêt bêjît em Kurd paşayên eşqê ne û bi hemû pîverên xuve berhevîn qurbanyê , dpênavê Evîna rasteqîneda bi deyn , ji bervê nmûna Şêxê Sen'an wergirtye ku êke ji Dastanên Folikloryên Evînîy ya rasteqîne.

---

[134] Tehsîn Îbrahîm Doskî, *b.n.b.,* r. 125.

Xanî di bêjît**:**

*Şêxî weku (pênce ) hec bjarî*

*Dîn kir te ji bo Kiça Kfarî*[135].

## 3.2. Efsane

Efsane layekê berçav û kartêkerê edebyatên Foliklorî ye , ku Dîrokeka nedyar û duyr û drêj heye , ku serhildan û di rust bûna wê dzivrît bu çerxê destipêk yên Mirovan ku weku amrazekê buye ji bu gehandna ewan hizir û bîrên Mirovan li bara ewan dyardên sroştyên ku li derdurên Mirovan dhatin dîtin , ji bervê Mirovî li destipêkê hizir li dyardên sroştyên derdurên xwe dikirin , ew dyardeye jî li gel reftarên têgehiştna Mirovî wî serdemî ya bi zehmet û dijwar buye , bu derbazbûn ji ewan dijwaryan Mirovan hewara xwe bu fentazî û aşupên kuyr birye , bu wan tiştên ku li derdurên wî di hêne rûydan , Efsane jî zêdetir ji bo karesatan dbir , bi ramanek din ew karesatên ku li derdurên Mirovan rûydan , Mirovan jî li beramber remzek ddana , bi taybetî ji layê ruhî ve anku Efsane bi ramana Çêrokên Xudayî di hêt.[136]

Yan jî Fong li bara efsaneyê di bêjît Efsane ewan rûydanan behis di ket ku li serdemên zor kevin da hatîne rûydan û dyardên kewnî û şyan û sedemên peydabûna wan rûn di ket.[137]

Eger bi huyirbînî seha evan pênaseyan bi keyn ku bu Efsaneyan hatînedanan dê gehîne wê baweryê ku efsane pêkdihêt ji ewan hizir û bîr û bawerên destipêkî yên Mirovî li bara dyardên siroştî derbirîne, anku efsane bi rengekê giştî peywendya di navbera Mirov û sroşt û derdur li gel peywendya di navbera mrov û Xudawendan bxuve digrît.[138] Anku Efsane weku amrazê zengînkirina edebyat û ş'raye bi taybetî , ji bervê Ehmedê Xanî weku Ş a'êrekê mezin û behremend û mezin mifa ji Efsaneyan wergirtye û krîne bnekuk bo deqên xweyên ş'rî.

---

[135] Hecî Ce'fer , *b.n.b.,* r.82.

[136] Bîl Muyirz, *Destellatî Efsane*, (Wer.: Sellah Hesen Pallewan) , Ç. êkê , Dezgehê Çap û Belavkirina Aras , Hewlêr 2008 , r.61.

[137] Nbîle Abrahîm , *elmasgur* , Tircme Cibra Abrahîm Cibra , Dar elhurye eltiba'e , Bixdad 1979, r .6.

[138] Şehla Krîm *, b.n.b.,* r39

Di nav Kurdan û Gelên din da Efsaneyek heye bnavê Heyze bûn , zêdebarî ku hindek Çafkanî bi Çêrokeka rasteqîne ddanin , belê hindek çafkanî jî behis li wê yekê di ken ku ev Çêroke Çêrokeka Efsaneyî ye , Çêrok behis li wê yekê di ket , ku Pîremêrekê ( Pîrekalekê ) Qurimçî hebûye û hêzeka zêde ldef hebû û çû tiştek neşyaye ewî bişkênît , ev Çêroke ji zarvekerî û karekterya sîhirbaz û falvekerekê bnav û deng bûye li serdemê Nuh Pêxemberî , Ehmedê Xanî mifa ji evê Çêroka Efsaneyî wergirtye û kirye bnekuk bu deqên xweyên ş'rî.

### 3.2.1. Kund - Bum

Bim - Kund - Bum êke ji balindeyên cwan , zarveker û karekterekê dyare di nava Çêrokên Efsaneyî da bi rengekê giştî di nav Gelê Kurd û 'Ereb û Farsan da nûşana Tarî û Xrabyê û Wêrankirinê ye û bi Çavê Tris û Şerî seha evî balindeyî di hêtekirin ku balindeyekê cwan û Çav Zelale , belê ji layê Ewrupan ve bi Çavekê Xêr û bê zyan seha evî balindeyî Bim - Kund - Bum di hêtekirin , ev balindeyê Efsaneyî babetekê berçave di nava edebyatan da û her Miletek jî bi reng û şêwazekê serederyê li gel di ket , ji bervê di nav Kurdan da Şa'êran mifa ji evî balindey wergirtye bir bnekuk kirina deqên xweyên ş'rî .

Bim - Kund - Bum Ehmedê Xanî weku wêneyekê Efsaneyî mifa jê wergirtye û beramber tirk bi karînane , anku Ehmedê Xanî Bum weku Balindeyekê Wêranker daye nyasîn û kirye sedema Kavilkaryê li Kurdistanê , anku Bim - Kund - Bum bi sedema Kavilkaryê ji layê Xanî vi di hête dîtin.

*Ger dê hebwa me Padşahek*

*Layq bdaya xudê kulahek*

*Te'îyn bibwa ji bo wî Textek*

*Zahir ved bu ji bome bextek*

*Hasil bibwa ji bo wî Tacek*

*Elbete dbu me jî ewa cek*

*Xexwarî dkir li me Yetîman*

*Tînayne derê ji dest le Îman*

*Xalb ne dbu li ser me ev Rom*

*Ne dbuyne xrabeyî ddest (Bum).*[139]

Ehmedê Xanî di vê parçe ş'rê da liser duza Kurdî hatye deng û baştirîn mîna bo Romê krî ewe ku bi Bim - Kund - Bum ê daye nyasîn , bi wî rengî ku Rom wekî Bim - Kund - Bum ye di Wêrankarî û Kavilkarîkirina Kurdistanê da û Kurdistan weku Kavilkaryekê ye di destê Romê da, Xanî di bêjît eger me Kurdan paşayekê Xudan Tac û Text hebaye , ku xem jme xwarbaye em jî nedkeftîne bin destê (Bim - Kund - Bum ) ê. Anku ji layê Ehmedê Xanî ve Bim - Kund – Bum nûşana Şer û Wêrankaryê ye , herweku di naveroka ş'rê da derdkevît , her weku derdkevît ku Xanî bi baweryeka kevna Kurdî reftarê li gel balindekê cwan û serincrakêş kirye û bi hêmayê Şer û Kavilkaryê jî dizanît.

Ev yek jî derbirînê ji karînana hizir û bîrên belav û kevnarên Kurdî di ket û giringî ya wê ji layê Xanî dyar di bît, anku Xanî bizav kirye hindek ji hizir û bîrên kevnarên Gelê Kurd binivîsît daku ji nav neçin, ji bervê di Mem û Zîna xwe da çendîn babet bvî rengî wergirtîne û bnekuka nmûnên ş'ryên xwe pê avakrîne.

**3-2-2- Cih Gohrîn**

Di Efsana Kurdî da babetekê berçav heye , bÎnavê Cih gohrîn , ev yek jî ji ber wê yekê di hête serhildan ku kesanên Dan'emir tuşî arîşe û prisgirêkan buyne ev yek kirye , yan jî dema ku tuşî derdeseryan bûy , eve pêdvî dîtye ku Cihê xwe bguhrin daku ew derdeserî bo bibne çakî , bi rengekê giştî eve babet , yan jî karekê Zansitî nîne , belku karekê Efsaneye , ji berku bvî kareyî çû ji encamên karan nahêne guhrîn , yan jî dema kesanên Dan'emir û kevnên di nava Kurdewaryê da yarî dikirin , bi taybetî li dema tuşî skeştinê dbûn Cihên xwe dguhrîn , dyare wesa hizirdkir ku hindek Cih ji hindek Cihên din pîruztrin , ji bervê Cihên xwe dguhrîn , anku ev Cih guhrîne bitnê reftareka Efsaneyî bûye , eger ne çû tişt nahête guhrîn , Ehmedê Xanî jî

[139] Tehsîn Îbrahîm Doskî, *b.n.b.,* r. 125.

ev meseleye veguhastye nava Mem û Zîna xwe da û reftara wê daye ser mlên Bekir - Bekoy anku wî di vêt li dema yarîkirinê da Cih guhrînê encam bdet , Ehmedê Xanî li zardevê ( Bekir )î babetê Efsaney vidguhêzît û di bêjît :

*Guld bend û leyînir û ce bi durn*

*Hun her du cîhan bi hev bgurn*

*Mîr rabu çû hibhê Memê jar*

*Mem hate cibhê ji pêşve dilldar.*[140]

Diyare Ehmedê Xanî mifa ji evî babetê Foliklorî wergirtye , ku ew jî efsaneye , ji bervê Bekir î her weku Kurdan hizirkirye û duvda Zînê karê Mem î xrap kirye , heta wî radeyî ku Mîr – Paşa î li Mem î biryeve..

Xanî di bêjît:

*Mîr bir ji memê Şeş dest*

*Mem bu ji meya ji pêşve sermest.*[141]

Diyare jî hetaku paşayî Cihê xwe negohrî bvî rengî bi serê wî nehat, û paşa bvî rengî tuşî skeştinê krî, belê li vêre ji ber sedema dîtna Zînê mem tuşî skeştinê bûye nek ji ber sedema ce gohrînê, weku di vê Efsaneya Kurdî da hatî , anku ev ce gohrîne bitnê babetekê Efsaneyî ye û tiştekê din nîne , Ehmedê Xanî mifa ji evê Efsaneyê wergirtye bo bnekuk kirina deqên Şş'ryên xwe.

### 3.3. Gutnên Mezinan

Mutnên Mezinan regezekê giring û babetekê berçav yê edeba Foliklorî ya Kurdî ye , rulekê giring dbînît di zengînkirina edeba Kurdî ya nû da , bi ramanek din Gutnên Mezinan çafkanyeka zengîn ya edeba Foliklorî ya Kurdî ye û di bîte amrazek ji bû zengînkirina edeba nivîsayî ya Kurdî , Gutnên Mezinan hemû ewan Axiftin û

[140] Hecî Ce'fer , *b.n.b.,* r.61

[141] Hecî Ce'fer*, b.n.b*, r.65

Ezmûnên Ciwan û bi qedrin , ku dev bo devî û cîl bo cîlî ji bab û bapran bo me mayne, ku ev yek jî ji encamê ewan taqîkirin û Ezmûnên jyanê hatîne berhemînan ku çendîn hizir û taqîkirinên cwan û tejî raman li xwe girtîne , zêdebarî ku ji rûyê şêwazî ve sade û sanahîbûnek pêve dyare , belê ji rûyê naverokê ve çendîn derbirîn û remzên giring pêşkêş di ken , ku dibne çrayek ji bo runahîkirina rêyên taryên Mirovan , ji berku Gutnên Mezinan ewan meselan rûhin di ken ku herdem mrov tuş dibnê û bivê egerê jî çakî û xrabî û xupersitî û pak û şyan û bextyarî ya xwe dnasît û peywendya Mirovî li gel hevdû û li gel cvakî nûşa di det [142] ji bervê di hemû serdeman da bûye wêrdê serizmanê xelkî û berdewam di bêjin , ev yek jî ji ber sedema wê yekê ye ku Gutnên Mezinan sedema têgehiştin û agehdarbûna Mirovaye li bara rûydanên derdur, ev yek jî di bîte sedema baştir têgehiştna Mirovî di têgehiştna rûydanan da û destxuve înana baştirîn çareseryan bo encamên rûydanan , anku giringî ya Gutnên Mezinan hemû bwarên jiyana Cvakî bi xuve digrît bivê yekê jî hemû takên Cvakî di kevin da Xudanên wan bûn , dîsan di serdemê nû jî da Xudanên wanin û herkes dkarît bu mebesteka taybet bi karbînît ji bervê Ehmedê Xanî jî weku kes mifa ji Gutnên Mezinan wergirtye û krîne bnekuk bu deqên ş'ryên xwe , anku di rêya Gutnên Mezinan da merem û armancên xwe destinîşankirîne û paşan bo me ragehandîne , dvî warîda Gutnek heye di bêjin :

Mar Dûjimne çi Bçîke çi Mezine.[143]Eve êke ji Gutnên herî berbelav li deverên Kurdan da , Kurd li wê hizrê ne ku Mar herdem Dujimne , nabît bi çû rengan baweryê pê bi keyn , ji berku Dujmindaryeka kevnar di navbera Mar û Mirovî heye ku ev Dujminkarye jî dzivrît bo serdemê adem û hewayê , bvî rengî dyar di bît ku Ehmedê Xanî mifa ji Gutnên Mezinan wergirtye û krîne bnekuk bu deqên ş'ryên xwe herwekî Ehmedê Xanî di bêjît:

*Hukam ji cinsê Şae Marin*

*Eshabî semum û muhre darin*

*Mihran ku di den bzan ku Jehre*

[142] Şukirya Resul, *Pendî Pêşînan û Qsey Nesteqî Kurdî* , Çap û Blavkirina Emîndarya Giştî Ya Rewşenbîrî Ya Lawên Devera Kurdistan , Hewlêr 1984 , r.134- 135.

[143] Hacî Cefer , *Gotnên Mezn li Devera Badînan* , Bexda 1986 , r.98.

*'Aqil hezerê di ken Jimaran*

*Xafl dibne muhb û Yaran.*[144]

Eger bi huyrî seha evê kupla ş'ra Ehmedê Xanî bi keyn ew yek bo me dyar di bît ku Ehmedê Xanî dibnekuk kirina deqên ş'ryên xwe da mifa ji hizra evê Gutna Foliklorî ya Kurdî wergirtye û bnekuka ş'rî ya xwe pê cwantir kirye , hizir û bîrên Gutnê li gel hizir û bîrên xwe têkel krîne û wêneyekê Cwan û pir ramantir jê di rustkirye , li vêre Xanî di bêjît hakim weku regezê Marî ye hevalê jehir û tirsê ye , mihra wan weku jehrê ye , ew muhra ku di den her wekî Hehir û Riq Hehir û Reqê ye , her kesê têgehşitî bît dê xwe parêzît ji Marî û her kesê ku bê agee jî bît dê bîte dust û hevalê Marî , ku ev yek jî karekê nezananeye , ji berku çû caran mar û Mirov nabne dust , belku herdem Dujminên hevdû ne.

### 3.4. Çîrok

Hemû ew Çîrok û serhatyên Foliklorî bxuve digrît ku dev bo devî û cîl bo cîlî ji bab û bapîran ve bu me mayî , ev Çêroke hindek caran Çêrokên rasteqîne buyne , yan jî hindek caran Çêrokên helawîstî buyne û paldayne pişt kesekê , ev yek jî ji ber sedema vyana kesê helawîstî , bo mîna Çêroka sexaweta hatemî , Çêroka Xidirê zînde di resen da ev Çêroke di bît Çêrokên rasteqîne bin , belê li dema vegêranê da ew reftarên ku dayne pal wan Çêrokê duyr di ket ji rastyê û nêzîk di ket ji Efsaneyê , ji berku Xudanên evan Çêrokan berzebûyne , buyne Çêrokên Foliklorî , ew bixwe renge destipêkê Xudanên evan Çêrokan rastî bin û Xudanên wan jî dyar bin , Ehmedê Xanî mifa ji vî babetî wergirtye û veguhastîne di nava Mem û Zîna xwe da û dvî warîda Ehmedê Xanî di bêjît û behis li Xidirê zînde di ket , Çêroka Xidirê zînde bixwe Çêrokek ulî ya rasteqîneye belê ji ber sedema şêwazê veguhastinê û ew zêdeyên ku liser hatînekirin dişyanên zarvekerî û karekteryê çêrokî derkeftye û ji çêrokeka rasteqîne hatye guhrîn bu çêrokeka Foliklorî û ev kesatye bixwe kesatyekê

[144] Hacî Cefer , *b.n.b.,* r. 98.

uldarî û baş bûye û rêyê nûşa Xelkî ddet , bi hizra Kurdan Xidirê Zînde ew frîşteye ku rizqî bi ser xelkî da belav di ket , Ehmedê Xanî Xidirê Zînde di Mem û Zînê da nûşadaye , ku ew jî bi rê bo memî nûşa daye , Ehmedê Xanî di bêjît :

*Bu qelqeleyek di Qelbê xemgîn*

*Esla nebu dXanî teskîn*

*Naçar ji Xanî ew bi derkewt*

*Ew da'ye Xidir çi bu bberkewt*

*Ew Xidir çi bu teşewqa Dil*

*Ew şewq çi bu te'eşuqa Dil*

*Qelbê wî digel wî buye baxî*

*Kêşan û keşan ge hande baxî.*[145]

Eger bi huyrî seha naveroka ş'rî ya Ehmedê Xanî bi keyn dê bînîn ku wî Xidrî Zînde bi rengekê Foliklorî wergirtye , ji berku çendîn babet û amaje dayne pal wî ku di jêwarî da naguncît û zêdetir nêzîkê Foliklorî di bît û Ehmedê Xanî di bêjît:

*Tacdîn seknî û pirsyar kir*

*Pirsa xwe bi êkê xityar kir*

*Gu ey Xidirê rehê hdayet*

*Bêje ep belaye bê nihayet.*[146]

Li vêre Xanî bi Dudu rengan behsê Xidirê Zînde di ken ya êkê Xidir weku kesatyekê uldarî behis di ket û behis li danûstandna tacdîn û Xidrî di ket ku Tacdîn li tenşit Xidrî di runt xwarê û pirsyarên xwe ji layê wî ve dînît Zman û daxwazê jê di ket ku arîşeya wî çareser bket û rêya rasterêbûnê nûşa bdet daku ew nexoşya mezin

[145] Hacî Cefer , *b.n.b.,* r.56-57

[146] Hacî Cefer , *b.n.b.,* r.57.

tûşî wî buy ji wî ve bi bît , ji aliyekê din ve neduyre merema Ehmedê Xanî kesatya wî ew nebît û cilkê Xidrî bket ber wî , di herdû waranda ew kesatya ku Tacdîn çuye layê wî û behis li arîşeya xwe di ket , dçîte dçarçuvekê duyr ji jêwarî , dçîte dçarçuvekê Foliklorî da , ji berku nabît Tacdîn li gel kesatyekê bvî rengî danûstandinê bket , ev rengê Çêrokan di nav Kurdan da belav buyne û çû kes jî bi xwe bi Xudanên wan nadanin , belku hemû Gel Xudanên wanin , Ehmedî Xanî mifa ji vî curê Çêroka Foliklorî wergirtye û kirye bnekuk bu deqên ş'ryên Mem û Zînê.

‘Enqa Sîmerx êke ji wan Balnidên ku di hênedîtin di nav Çêrokên Efsaneyî da, 'Enta Balindeyekê Aşûpî ye û navê wê di gelek ji Çêrokên Foliklorî da heye, dencam da heta niha ev balindeye nehatye dîtin di Çêrok û çîvanukên Kurdî da , Sîmerx balindeyekê mezine , pehlewanê Çêrokê di danîte ser Şaperên xwe û dçîte ber heft perên esmanan , yan heft tebeqan dbete bin 'Erdî da , herdem layê xêrê digrît û harîkarya kesanên bê desthelatan di ket.[147]

Ev balindeye di ş'rên pranya Şa'îrên 'Ereb û Fars û Kurdan da di hête dîtin û ji layê Yonanî û Rumanyan jî ve dîsan di hête dîtin , ev Balnidê Efsaneyî Çêrokên jêkcuda liser hatîne , ji bervê Ehmedê Xanî jî mifa ji evê Çêrokê wergirtye û kirye bnekuka wêneyekê Cwan û serincrakêş di Mem û Zînê da , Ehmedê Xanî di bêjît:

*Gu qet ne weye weku wî guhtî*

*Mîrm perîya dilê min suhtî*

*Şehzadeye şehinşîn mikane*

*'Nqaye Bilinde aşyane*[148]

Yan jî Xanî di bêjît:

*M'bub bi Dil bêt , bi evraz çi hacet*

*'Nqa bixwe bêtin firr û perwaz çi hacet.*[149]

---

[147] Hacî Cehfer , *b.n.b.,* r.162.

[148] Hacî Cehfer , *b.n.b.,* r.57.

## 3. 5. Hijmar

Di hizir û bîrên hemû Gelan da çendîn hizir û bîrên nafxuîy û millî û Foliklorî di hêne dîtin , êk ji wan Hijmareye , ji layê pranya Gelên weku Yonan û Roman û Misryên kevin da Hijmar hatye bi karînan her çende ev Hijmarê çû bnemayên rasteqîne nînin belê her di hête bi karînan , her Hijmarek jî remzeke bo serhatî û ruydanekê û hindek remiz jî bu Dilxuşyê û hindek jî bo rûydanên Nexoş û tejî Tris û Karesat di hêne bi karînan , her pişkek ji wan derbirînê li Bext û çarenivîsekê di ket , belê çû ji evan HiJimaran naçne di çarçuvekê Zansitî da , belku diçne dçarçuvê hizir û bîrên nafxuîy û millî û Foliklorî da , Ehmedê Xanî jî bi rengekê berçav ev Hijmare ku Remzên Foliklorî û nafxuîy û millî bi karînayne Ehmedê Xanî bi pêdvî zanye ku HiJimaran 'Ded di Mem û Zînê bi karbînît , anku bi pêdvî ya Mem û Zînê jmare bi karînayne , hindek caran weku hijmartneka hişk û rast bi karînayne , hindek caran jî bo rûydaneka pêdvî bi karînaye , eva ku Xanî bi pêdvî dzanît binivîsît.[150] Anku di karînana Remzan da Ehmedê Xanî bi merem Jmar bi karînaye, ev mereme jî li gurî Remzan di hête gohrîn.

#### 3.5.1. Hijmara Êkan

Xanî di bêjît:

*Ey Wahdê bê şerîkê yekta*

*Wey wa cidê bê negîr û hemta*

*Ey baqîê bê zewalê dayîm*

*Wey hadêy bê fenaêy qayîm.*[151]

Dema ku behis li Hijmarê di hêtekirin di vêt destipêkê behsê Jmara Êkan bhêtekirin, ev yek jî ji ber Dudu sedemane, sedema Êkan hijmara êkan destipêka hemû hijmaraye û hijmarên din bi duvda dhên, û sedema duduyan jî Xudayê mezin

---

[149] Hacî Cehfer , *b.n.b* , r.163

[150] Hacî Cehfer , *b.n.b.* , r70.

[151] Tehsîn Îbrahîm Doskî , *b.n.b.,* r.17 .

êke û nabîte di duyan, ji bervê Xanî hijmar êkan bi navê Xudayê mezin danaye , Xanî bi zmanekê sufyanî bo meselê çuye , bi bawerya sufyan jî xudê bnekuka hebûn û bitnê ye.

#### 3. 5. 2. Hijmara Duduyan

Hijmara Suduyan di hizir û bîrên nafxuîy û mllên Kurdî da , Hijmarek Xirabe û nûşana Tris û xrabi karyê ye , ji bervê Gelê Kurd herdem di tris û diltengyê da bûyne , ji ber ewan derdseryên ku bi serê ewan hatîn , heta xwe li dema Çandin û Dexludanî û Durînê jî da herdem ji wê yekê Tirsyayne daku mandûbûna wan berav da neçît ji bervê dema ku dest bi pîvanekirina hijmare duduyan kirye bi şeytanî ve grêdaye , ev hizir û bîre jî hizir û bîrên nafxuîy û millî û Foliklorî ne , Ehmedê Xanî ev hizir û bîre di nav cvakê Kurdî da înayne û Cihê wan di nava Mem û Zîna xwe da kirye.

Xanî di bêjît:

*Qeyser bi qwswurya xwe qasir*

*Haçir gerya bi 'eynê basir*

*Şahê 'Erebî 'elem ku rakir*

*Kesraêy 'Ecem 'Ecem duta kir*

*Rom û Hebeş û Rreng û Tatar*

*Her çî ku nekr bi Dînî qrar*[152]

Dipişkeka zor ya Gelên Cîhanî da , bi Dudu kesan kar nahêne encam dan û zor caran jî bi kesekê , yan jî Dudu kes encam di den , ji berku jmara dû bi hijmareka Şûm û Xrab di hête zanîn , weku jmara duberekyê û ajawegêryê di hête nyasîn.

Di nava Kurdan da gutnek heye di bêjît :

---

[152] Tehsîn Îbrahîm Doskî , *b.n.b.,* r.29.

Xuyaye ke wnabê be dû - Ya diyare ku Kew nabîte Dudu anku ev bawerye baweryeka Foliklorî û millî ye û Ehmedê Xanî ev hizir û bîre di nav Xelkî wergirtye û kirye bnekuk bo ş'rên xwe û Mem û Zîn pê Cwantir kirye û bizav kirye evan hizir û bîrên Gelê me bparêzît.

#### 3.5.3. Hijmare Sisêyan:

Eger berê Xudanekê bo keltûr û hizir û bîrên hemû Gelên Cîhanê bi keyn , ew yek dê bume rûn bît ku Hijmare Sisê Hijmareka pîroze , Xelk hemû bi çavekê rêz û Xêrê seh di kenê û dilxuşya xwe bivê Hijmarê grê di den , hest bi hêzeka sihrî di vê Hijmarê da di hêtekirin , bi rengekê ku Çêrok û Heqîqetên millî û Foliklorî di tejî ne ji evê Hijmarê , di nava Kurdan jî da bi heman reng bi çavekê Xêrê seha evê Hijmarê di ken Çîrok û Çîvanuk û serhatên wan dêrn ji vê Hijmareyê (1)[153]. Herwesa di nava Gelê Fars û 'Ereban jî da ev Hijmare bi heman sehkirin seh di ketê , ji layê Roman û Yonan Hijmare sê , hêmayê Cnis - Regez î bûye , Ehmedê Xanî bi heman hêma û bi remzê Xêrê ev yek zanye , û ev hizre jî ji hizir û bîrên millî û Foliklorî wergirtîne , Xanî di bêjît:

*Şekir ji le bêd yek revandin*

*Swirgul ji ruxêd yek cevandin*

*Terkîbkirin ji bo xwe kulqend*

*Tzuyc ku bun bi yekve dilbend*

*( sê ) Roj û Şevan Dil peya pey*

*Wan teşne le ban vexwardin ew Mey*[154]

Li vêre Ehmedê Xanî jimare ( sآ ) bi çend meremekan bi karînaye , êk ji wan merema jî dşev û rojên zavanyê da em azadîn , weku remzekê bi karînaye , yan jî hêz û şyanên guhnêlyê bi jmare sê dyarkirye , eger bivê meremê jî Xanî jmare sê bi karînabît , li vêre ew yek bo me rûn di bît ku Xanî şarezayeka baş di felsefa îwnanî

---

[153] Hecî Ce'fer , *b.n.b.,* r.75.

[154] Hacî Cehfer , *b.n.b.*, r. 75.

da hebûye , ji bervê babetek ji hizir û bîrên îwnanyan wergirtye , ji berku ev hijmare ji layê îwnanyan ve heman merem û raman heye , ya ku Xanî bi karînayî.

## ENCAM

Foliklor samanekê neteweyê mezine û hemû Gel jî Xudanên wanin û Dîrokeka duyr û drêj heye , bi ramanek din Dîroka wê dzivrît bo Dîroka di rustibûna Şaristanya waye , ev samanê neteweyî çendîn cur û babetên jêkcuda bxuve digrît ji wan jî Dastan , Çîrok , Sitiran , Efsane , Axiftnên Nesteq , Gutnên Mezinan, Meteluk , Lawk û Pêgutin , Beyt û ... hwd , ev babete dibne pişkeka berçav di edebyatên Foliklorî da û bnemayekê başe bo zengînkirina edebyatên nû.

Ehmedê Xanî mifayekê baş ji babetên Foliklorî wergirtye û krîne bnekuk bo Mem û Zînê.

Ehmedê Xanî êke ji Şa’êr û 'Arf û Rexnegir û Feylesûfên Gelê Kurd.

Xanî di Mem û Zînê da çendîn nhênî û merem aşkra krîne , anku dpişt nivîsana Mem û Zînê da çendîn meremên veşartî jî hebuyne , herwekî ew bixwe di Mem û Zînê da amajê bo vê yekê di ket , Ehmedê Xanî Dilxuşî û Xem di Mem û Zînê da bi karînayne.

Hizir û bîrên ulî û nafxuîy û millî bi karînayne, ew hizir û bîr û bawerên mîllyên ku bi rengê ewî vyayî gorankarî bi serda înayne û duvda nivîsayne , bo vê meremê jî hizir û bîrên Memê Alana Foliklorî wergirtîne û bi rengekê taybet bi xuve carek din darşitîne , peywendyeka bi hêz di navbera Mem û Zîna xwe û Memê Allana Foliklorî bi karînaye.

Ehmedê Zanî ji berku kesatyekê Ulî bûye , ji bervê çendîn Amajên Quran û Fermûdên Pêxemberî ( s , x ) bi karînayne û her ji destipêkê jî bi Wesf û pesnên Xudê dest pêkirye û duv da bi Wesfên Pêxemberî ( s , x ) çendîn Çêrokên Ulî di Mem û Zînê da bi karînayne , li gel amajeyên ncîl û îzîdîxanê , her çende Xanî kesatyekê Ulî û Sufî bûye , belê babetên Êzdîxanê jî bi karînayne.

Ehmedê Xanî mifa ji balinde û Terş û Kewalî jî wergirtye weku hizir û bîr û baweryên millî di Mem û Xînê da ku bi rengekê rûn û aşkra di hêtedîtin, bo vê meremê jî çendîn Dastan û Çêrok û Efsane û Gutnên Mezinan vegêrayne ji wan jî ( Kund - Bum - Bim , 'Eşqar , Mar ev yek jî bi rengê hizir û bîr û bawerên millî bi karînayne.

Anku bi rengekê giştî mifa ji folkor û hizir û bîr û bawerên millî wergirtîne.

Ev kare jî bi rengekê sanahî û sade nebûye , belku bi merem ev kare krîne.

Diyare mebesta Xanî kumkirina hizir û bîr û bawerên millî ne daku ji nav çûnê bhêne parastin.

## LÎSTA JÊDERAN

### A. Bi Zimanê Kurdî

**BÎL MUYIRZ**, *Destellatî Efsane,* Wergêrrana Sellah Hesen Pallewan,

Çapa Êkan, Dezgehê Çap û Belavkirina Aras, Hewlêr 2008.

**CE'FER ŞÊX HISÊN BERZINCÎ**,*Çend Miluyek Leşaray Foliklorî Kurdî,* Çapxana Jîn, Silêmanî 1969.

**CEMAL MIHEMED EMÎN**, *Dîwana Hemdî,* Çapxana Serkewtin, Çapa Duduyan, Slêmanî 1985.

**CILAL TQÎ**, *Le Yek Çûnî Efsaney Gelan,* Ko Kelepurî Kurdî, Komella Kelepurî Ya Kurd Slêmanî 1992.

**CIWAN, MURAT,** *Ehmedê Xanî Jiyan, Berhem û Bîr û Baweriyên Wî*, Stênbol 1997.

**CUDT HOŞYAR**, *Ji Xar (Altras Alkirdî Fî Xrab Btirsurx)*, Alimgib'e Karwan, Arbîl 2011.

**DILLŞAD MEHMUD 'EBDURHMAN**, *Îsma'îl Heqqî Şaweys*, Çapa Êkan, Rêveberya Rewşenbîrî Ya Hewlêr, Hewlêr 2004.

**ÊDÎQ BOREKÎ**, *Mêjûy Wêjey Kurdî*, Bergê Sêyê, Dezgay Çap û Belavkirina Aras,Hewlêr 2008.

**EHMED QENDÎL,** *Hunerî Heyran*, Çapxana Rojellat, Hewlêr 2012.

**EHMEDÊ XANÎ,** *Eqîdeya Îslamê*, Weşanên AKYADê, Agirî 2014.

**……………………**, *Mem û Zîn*, (Wer.: Rudînîko), Çapxana Rojellat Mosko 1962.

**……………………**, *Mem û Zîn*, Çapa Sisêyan, Çapxana Rojellat, Silêmanî 1968.

…………………, *Cewheru'l Me'anî fî Şerhu'l Dîwanu'ul Ehmedî Xanî*, (Wergera 'Erebî: Tehsîn Îbrahîm Doskî), Weşanên Sipîrêz, Duhok 2005.

…………………, *Mem û Zîn* (Wer: M.Emin Bozarslan), Weşanên Hasat, Stenbol 1990.

…………………, *Mem û Zîn a Ehmedê Xanî* (Amd: Huseyn Şemraxî), Weşanên Rawza û Nubiharê, Stenbol 2011.

…………………., *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî* (Wer: Perwîz Cihanî), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2007.

………………….., *Eqîdeya Îmanê,* Weşanên AKYADê, Agirî 2014.

………………….., *Hemû Berhem* (Berhevkar: Kawa Nemir,Selîm Temo),Weşanên Lîsê, Stenbol 2008.

**'ELALDÎN SICADÎ,** *Mêjuy Edebî Kurdî*, Çapxana Me'arf, Çapa Duduyan, Bexda 1971.

**ERISTO,** *Hunerî Şi'ri,* Wergêrana 'Eîz Gerdî, Çapa Dudyan, Çapxana Genc, Silêmanî 2011.

**ESKENDER SELÎM MZÎRÎ**, *Lêvekollîfek Le Ser Dasaan Sitratîjê Foliklorî*, Kovar Asoya Foliklor, Hijmara 5, Hewlêr 2001.

**EVREHMANÎ HACÎ MARF**, *Le Barey Kurd Nasîyewe Le Rusya û Yekêtî Sovyet*, Çapxana Kora Zanyarî Kurd, Bexda 1974.

**FERHAD PÎRBAL**, *Kurd Le Dîdî Rojhellatnasekanewe*, Çapxana Şivan, Hewlêr 2009.

**FERHAD QADIR KRÎM**, *Binyadî Wêne Le Şî'rî Himdî Da*, Vekulîn Nama Diktorayê, Zankoya Silêmanî 2009.

**HECÎ CE'FIR**, *Mem û Zîna Xanî*, Çapa Êkan, Çapxana Aras, Hewlêr 2009.

**HEJAR MUKRAYANÎ**, *Mem û Zînî Xanî*, Çap û Belavkirina Çiwarçra, Silêmanî 1394.

**HÎMDAD HUSÊN**, *Edebyatî Foliklorî Kurdî*, Çapa Êkan, Çapxana Şehîd Azad Hewramî, Hewlêr 2007.

**ÎBRAHÎM HESEN HEMED**, *Rengdanewey Kelepur Le Romanî Kurdîda* (Başurî Kurdistan 1985- 1991*),* Çapxana Rojhellat, Hewlêr 2012.

**ÎDRÎS 'EBDULLA**, Edebî Mîllî û Foliklorî, Bergê Sêyê, Çapxana Hacî Haşm, Hewlêr 2014.

**ÎWRÎ SULUV**, *Qezayae û Tarîxyae*( Tircme: Hilmî Ş'rawî Û 'Bdulmicîd Hwas), Alhe Almêrîye Ltirlîf Û Alnişr, Qahre 1971.

**'ÎZEDÎN MISTEFA RESUL** , *Lêkolînewe Le Edebî Kurdî*, Çapxana , Zankoya Silêmanî , Çapa Duduyan , Silêmanî 1979.

…………………………………, *Lêkolînewey Edebî Foliklorî Kurdî*, Çapa Sisêyan, Dezgehê Çap û Belavkirina Aras, Hewlêr 2010.

**KAMERAN MUKRÎ**, *Edebî Foliklorî Kurdî*, Pişka Êkan, Çapxana Zankoya Sellahedîn, Hewlêr 1984.

**KAWL MÊGFÎ ELŞÎBÎ**, *Dîwan Hlac*, Bexdad 1974.

**LÎJINA EDEB LI KORA ZANYARÎ YA KURDISTAN**, *Zaravên Edebî*, Çapxana, Wezareta Perwerdê, Hewlêr 2006.

**MARF XEZNEDAR**, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergê Êkan, Çapa Duduyan , Çapxana Aras , Hewlêr 2010.

**MELE MEHMÛDÊ BAZÎDÎ**, "*Alexander Jaba" Recueil de Notices et rêcits Kurdes û Kurdistan*, St. Petersburg 1860.

**MEWLUD ÎBRAHÎM HESEN**, *Pêkhatey Efsaney Kurdî,* Çapî Êkan, Çapxaney Renc, Slêmanî 2007.

**MIHEMED EMÎN ZEKÎ BEG**, *Tarîx al-Kurd û Kirdistan*, Çapa Duduyan, Qahîre 1939.

**MHEMED FERÎQ HESEN**, *Memleketî Masî* , Çapa Sisêyan , Dezge û Çapa Belavkirina Aras , Hewlêr 2010.

**MHEMEED EHMED HESEN,** *Bînay Rudaw Le Çîrokda,* Kovara Raman, Hijmara 115, Hewlêr 2006.

**MIHMUD ZAMDAR**, *Dirwazeyek Bo Awaz û Goranî Kurdî,* Dar Alhirye Algba'e, Bexdad 1980.

**MUHEMED M'ÎN,** *Ferhengî M'în* , Çapa Pêncê , Wîrasta Duduyan , Antişarat Alşic' , Tehran 1388.

**MUHSÎN EHMID 'UMER**, *Ferhenga Edebî,* Çapxana, Hemdî, Silêmanî 2012.

**NCIM XALD ELLWENÎ**, *Pend û Qsey Nesteqî Kurdî Şarî Xaneqîn*, Çapa Êkan, Çapxana Mukiryan, Hewlêr 2008.

**NESRÎN RÛKIŞ**, Cilwe *Hay Kudek Dramat Nzim Kirdî*, Çapa Êkan, Çapxana Rojhellat, Hewlêr 2014.

**Q.K.KURDOYÊV**, *Kurdnasî*, (Wer: Rewf Hesen), Rêveberya Xana Wergêranê Li Silîmanî, Silêmanî 2006.

*………………………, Roçûneyek Bo Edebî Kurdî Le Rojhelatî Kurdistan,* Çapxana Lerya, Silêmanî 2012.

**QANATÊ KURDO,** *Tarîxa Edediyata Kurdî, (Wer: Ziya Avci)* Weşanên Lîsê,Stenbol 209.

**SCADE AWARE**, *Vekulîna Edebî Nwê Î Kurdî*, Çapxana Jîn, Silêmanî 1967.

**S'DALLE LISMA'ÎL ŞÊXANÎ,** *Têksitî Çend Heqayetêkî Foliklorî Kurdî,* Çapxaney Alhwars, Çapa Êkan, Bexda 1978.

**ŞEHLA KERÎM HISÊN**, *Karîgerî Edbî Foliklor Leşî'rî Medhed Bêxew Da*, Nama Masterê, Zankoya Sellahedîn, Hewlêr 2015.

**ŞEREFXAN BITLÎSÎ**, *Şerefname*, (Wer: M.Emîn Bozarslan), Weşanên Dengê, Diyarbekir 2006;Weşanên Nûbiharê,İstanbul 2013.

**ŞUKIRYA RESUL ÎBRAHÎM,** *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb,* Mgabh Altihlim Al'alî, Arbîl 1989.

**……………………………….** , *Pendî Pêşînan û Qsey Nesteqî Kurdî,* Çap û Belavkirina Emîndaretya Rewşenbîrî Ya Lawan Nawçeya Kurdistan, Hewlêr 1984.

**……………………………**, *Edebî Foliklorî Kurdî,* Pişka Dûyê, Hewlêr 1984.

**…………………………..** , Edeba Foliklorî Ya Kurdî, Beşa Duduyan, Çapxana Zankoya Selahedîn, Hewlêr 1984.

**TEHSÎN ÎBRAHÎM DOSKÎ**, *Mem û Zîna Ehmedê Xanî,* Çapa Êkan, Çapxana Hacî Haşm, Hewlêr 2008.

**'UMER ÎBRAHÎM 'EZÎZ** , *Foliklorî Kurdî Le Rwange Rojhellatnasan û Nuseranî Kurdewe* , Ko Rewşenbîrî Ya  Nû , Hijmare 113, Kanûna Êkan , Hewlêr 1986.

**VARLI, ABDULLAH,** *Dîwan û Gobîdeyê Ehmedê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanên Derpêç, Enqere 2004.

……………………… , *Dîwan û Jînewarî Ya Ehmedê Xanî*. Weşanên Derpêç, Enqere 2004.

**XALD CUTYAR**, *Bere û Foliklor,* Çapxana Hewadis, Bexda 1984.

**MÎHEMED EMÎN ZEKÎ BEG,** *Dîroka Kurd û Kurdîstanê*. Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.

**B. Bi Zimanê 'Erebî**

**'ALÎ ALCIZÎRÎ**, *el-Adb el-Efaêy al-Kirdî,* elteib'e elpanye, moseset elseqafye, Beyîrut 2000.

**MEHMUD ZIHNÎ**, *el-Adb Alş'bî El'rbî*, Mifhumet û Micmune, Mitbu'at Cam'e el-Xirgum, Kahre 1972.

**NBÎLE ÎBIRAHÎM**, *Elma Sigure* (Tirucme: Cibra Îbirahîm Cibra), Dar Alhirye Ligba'e, Bexdad 1979.

……………………., *Aşkal el-E'îr Fî eladb el-Ş'bi,* Dar Nihçe Mêr, Qahre Dun Tarîx.

**NURÎ YASÎN HIRZANÎ**, *Miqdne Fî elfulklor el-Kirdî Drase Antir û Bulucye Actma'ye,* Mitb'e Şhîd Azad Huramî, Kirkuk 2006.

**WLÎM RANÊR**, *el-Rêgure û Elrdib*, (Tircume: Aêbah S'dun), Migb'e Dar el-Şown Alsqafye, Bexdad 1992.

## NASNAME/ ÖZGEÇMİŞ

**Kişisel Bilgiler**



Soyadı, Adı :………………….....

Uyruğu :Kürd

Doğum Tarihi ve Yeri :............................

Telefon :…………………

Faks :…………………

E-mail :………………….

**Eğitim**

| **Derece** | **EğitimBirimi** | **Mezuniyettarihi** |
|---|---|---|
| Yükseklisans | ………………………. | ………...... |
| Lisans | ………………………. | …………… |

**İş Deneyimi**

| **Yıl** | **Yer** | **Görev** |
|---|---|---|
| ………… | ……………. | ………………….. |

**YabancıDil**

……………

**Yayınlar**

………………

**Hobiler**

…………………..